المركز السوري للإعلام وحرية التعبير
Navenda Sûriyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê
Syrian Center for Media and Freedom of Expression

# Artêşên Sîyê

## (2)



image: Internet

# Artêşên Sîyê
## (2)

**Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê** navendeke serbixwe ne-hikûmî û ne-qezenc di 2004-an de li Fransa hatî tomar kirin,Li ser mafên mirovan û pêşveçûna medyayê disekine.Navend ji aliyê desteya rêveber a bê heqdest tê birêvebirin her weha navend xwedî posteke şêwirmendî ya taybet e di Encumena Aborî û Civakî ya Neteweyên Yekbûyî de ji sala 2011an ve.

Navenda Sûrîyeyî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê hewl dide civakek ku azadîya derbirînê û bawerîyê, mafên mirovan û dadmendîyê garantî bike, ava bike. Ji damezrandina wê di 2004 de, Navendê hewildanên xwe ji bo parastina parêzvanên mafên mirovan, berevaniya mafên mirovan û azadiyên bingehîn, bihêzkirina civaka sivîl û komeleyên qurbaniyan, û pêşxistina sektora medyayî ya serbixwe û profesyonel kiriye.

**Mafên belavkirinê © 2024 Navenda Sûrî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê (SCM)**

www.scm.bz/en

Ev raport sala 2024an ji aliyê Dr. Eymen Mun`im ve hatiye amadekirin

المركز السوري للإعلام وحرية التعبير
Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê
Syrian Center for Media and Freedom of Expression

# nanêlzêr û îsapS

**Serpereştiya giştî: Mazin Derwîş**

**Amadekirina Lêkolînê: Dr. Eymen Mun`im**

**Lêvegerandina Lêkolînê: Yara Bader rêveberê bernameyan**

**Spasî ji bo herkesê dinava Navenda Sûrî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê de û kesên pê re alîkar e ku di hemî qunaxên nivîsandina Raportê, jiqunaxa amadekirinê û ta bicîkirin û derxistina wê, alîkar bûn.**

# Content


**Pêşgotin** ........ 2

**Yekem: Komên Çeteyan li Sûrîyayê** ........ 4

1. Danasîna Çeteyan ........ 4

2. Komên Çeteyan ên Girêdayî Îranê ........ 5

2.1. Çarçoveyeke Giştî ya Çeteyên Îranê li Sûrîyayê ........ 5

2.2. Komên Çeteyan ên Iraqî ........ 10

2.3. Komên Xwecihî û Tevlihev ........ 16

2.4. Çeteyên Efxan û Pakistanî ........ 17

**Duyem: Kompanîyên Ewlekarî û Kompanîyên Leşkerî yên Taybet** ........ 20

3. Çarçoveyeke Têgihî û Qanûnî ya Giştî ........ 20

3.1. Danasîna Kompanîyên Ewlekarî û yên Leşkerî ........ 21

3.2. Birêxistina Qanûnî ya Kompanîyên Ewlekarî û Kompanîyên Leşkerî yên Taybet ........ 22

4. Kompanîyên Ewlekarîyê-Leşkerî yên Rûsyayî ........ 24

4.1. Çarçoveyeke Giştî ya Kompanîyên Ewlekarîyê-Leşkerî yên Rûsyayî ........ 24

4.2. Kompanîyên leşkerî yên Rûsyayê li Sûrîyayê ........ 27

5. Kompanîyên Ewlekarîyê-Leşkerî yên Ne-Rûsyayî ........ 34

5.1. Kompanîyên Ewlekarîyê-Leşkerî yên Tirkîyayî ........ 34

5.2. Kompanîyên Leşkerî yên Amerîkayî ........ 36

6. Kompanîyên Parastina Ewlehî ........ 38

**Qewîtî** ........ 41

## Pêşgotin

Beşa duyem a rapora Artêşên Sîberê ya sala 2024an balê dibe ser çekdarên biyanî yên li Sûrîyayê yên ku mirov dikare navê çeteyan li wan bike. Rapor her wiha balê dibe ser kompanîyên ewlekarî û kompanîyên leşkerî yên taybet û rola wan a di şerên çekdar de, her wiha rola van koman li Sûrîyaya ku bûye meydana grûpên çekdar, milîs, komên çeteyan û kompanîyên leşkerî û ewlekarî. Tevaya van aktor û koman dema şerê Sûrîyayê dirêj dikin û derfetên çareserîyê û bidawîkirina şer û pevçûnan ji nav dibin. Rûniştina hêza milîsan, desthilatîyên de facto, bicihanîna wan a beşeke peywirên dewletê bi rêya hêza çekan û destdanîna ser çavkanîyên dewletê di çarçoveya aborîyên cengê de, bingehên dewletê ên sistikî qelstir kirin. Pê re, navendên hêzê di nav civakê de cihên hev girtin û pêkhateyên mirovî yên ku ji sedên salan ve li deverê xwecih bûn, ji hev ketin û pergala wan şehitî. Êdî koçberkirina bi darê zorê bû çekeke jêneger a şer, nemaze li dij deverên dijber ên ku milîsan û komên çeteyan dest danî ser wan û xelkê wan ji kokê ve rakirin û ew li dewletên cîran û biyanistanê tarûmar kirin. Li hêla din jî, sektorên aborî û jîyanî ketin jêr serwerîya kompanîyên leşkerî û yên ewlekarî yên ku karên xwe ji bo parastina berjewendîyên Rûsyayê û bingehên wê yên leşkerî yên li welêt didomînin.

Jixwe ji wê gavê ve, wate piştî ku me beşa yekem a Artêşên Sîberê di sala 2022yan de weşand, derfetên çareserîya leşkerî û siyasî tengtir bûn, xizanî kûrtir bû û rewşa aborî ya kambax beşeke mezin a civaka Sûrîyayî da ber lehîya xwe. Pê re, prosesên leşkerkirina çeteyan berfirehtir bûn. Êdî li gor çavkanîyên ragihandinê, meydanên şer ên ku welatîyên Sûrîyayê lê bûne çeteyên Rûsya yan Tirkîyayê zêdetir bûne: Ji şerê Ermensitan û Azerbaycanê yê li Nagorno Karabaxê bigire heta bi Lîbyayê[1], li Afrîkayê[2] Bakurê Malîyê[3]-[4] û heta bi Venezuelaya[5] Amerîkaya Başûrî û di nava şerê Rûsyayê yê li dij Ukraynayê de[6]-[7]-[8]-[9]. Li vir jî ranewestîya,

1 "جيوش الظل - تقرير يسلط الضوء على ظاهرة تجنيد المرتزقة في سوريا"، المركز السوري للإعلام وحرية التعبير، https://scm.bz/shadow-armies-a-report-on-the-phenomenon-of-mercenary-recruitment-in-syria_ar/

2 محمد فوزي، "سكاي نيوز: تركيا تنقل المرتزقة السوريين من ليبيا إلى مالي"، الشاهد، 26 آذار 2021، https://tinyurl.com/4mru35d9

3 "Rights group says Mali army, foreign fighters executed civilians", Aljazeera.net, 24 Jul 2023, https://www.aljazeera.com/news/2023/7/24/rights-group-says-mali-army-foreign-fighters-executed-civilians

4 "Libyan & Syrian Mercenaries Accused of Aiding Malian Army", Libya Review, 18 Nov 2023, https://libyareview.com/39343/libyan-syrian-mercenaries-accused-of-aiding-malian-army/

5 Andrew Roth, "Russian mercenaries reportedly in Venezuela to protect Maduro", The Guardian, 25 Jan 2019, https://www.theguardian.com/world/2019/jan/25/venezuela-maduro-russia-private-security-contractors

6 Sultan al-Kanj, "Chechen fighters leave Syria to battle Russians in Ukraine", Al-Monitor, 22 Oct 2022, https://www.al-monitor.com/originals/2022/10/chechen-fighters-leave-syria-battle-russians-ukraine#ixzz8Wqllalj7 ; Ben Hubbard, Hwaida Saad, Asmaa al-Omar, "Syrian Mercenaries Deploy to Russia en Route to Ukrainian Battlefields", The New York Times, 31 Mar 2022, https://www.nytimes.com/2022/03/31/world/middleeast/syrian-mercenaries-ukraine-russia.html ; James Snell, "Syrian Fighters May End Up on Both Sides of the Ukraine War", Foreign Policy, 15 Mar 2022, https://foreignpolicy.com/2022/03/15/syrian-fighters-ukraine-russia-war/

7 هبة محمد، "النظام السوري يجبر أساتذة وطلاب الجامعات والموظفين على الخروج في مسيرات تضامنية مع الغزو الروسي لأوكرانيا"، القدس العربي، 10 آذار 2022، https://tinyurl.com/46xvxeve

8 Pierre Boussel, "Syrian Mercenaries in Ukraine: Delusion or Reality?", Carnegie Endowment for International Peace, 23 Jun 2022, https://carnegieendowment.org/sada/87382

9 "Over 40,000 Syrians reportedly register to fight for Russia in Ukraine", The Syrian Observatory for Human Rights, 15 Mar 2022, https://www.syriahr.com/en/243241/

çimkî Îran jî ket ser vê xetê[10] û navendeke leşkerkirina welatîyên Sûrîyayê vekir[11] da ku wan bişîne Yemenê û li rex Koma El-Hûsî şer bikin. Peymanên Îranê bi çeteyên wê re bi vî rengî bûn: Dema peymanê 3 sal bû û mûçeya mehane digihaşt 1000 $ bo kesên sivîl û 1200 $ bo leşkeran[12].

Dawîyê, ev rapor -bi her du beşên xwe ve- li gel nêrîna neguherbar a navendê ya der barê mafên mirovan de li Sûrîyayê digunce, ku gerek e di çarçoveya proseseke gelemper û bênavber de were meşandin, di nava projeyeke giştî de be û mafên mirovan di rêyên terîb de bên berbelavkirin: Mîna bibelgekirin û weşandinê, danîna nexşeya zêdegavî û binpêkirinên li barê mafên mirovan, qanûna mirovî di çarçoveya şerê li Sûrîyayê de, têkoşîna li dij xwevedizîna ji sizayan, sizakirina tawankaran û bikaranîna sazgêrîyên dadgerîyê yên ku berpirsyarkirina binpêkirinan li hemû deverên dadgerî xurt dikin; di nav de bikaranîna dadgerîya navdewletî û devera dadgerî ya cîhanî.

Di 22yê Tebaxa 2023yan de, Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê li bal Nivîsgeha Polîsên Tawanên Şer a Norweçê li dij pêşendamekî Milîsa El-Heşd El-Şe'bî ya Iraqê yê bi navê Huseyn El-Hicêmî gilî kiribû. El-Hicêmî li Norweçê rûdinişt. Wî di nav refên komên milîsa El-Heşd El-Şe'bî yên li Sûrîyayê de şer kiribû û bergumanê tawanên kuştinê û binpêkirinên giran bû. Navendê doza destpêkirina lêpirsîneke bingehîn der heqê lixwemikurhatinên El-Hicêmî de kiribû ku wî bi xwe li ser hesabê xwe yê Tiktokê[13] belav kiribûn. Di 21ê Tebaxa 2023yan de, Nivîsgeha Polîsên Tawanên Şer a Norweçê wergirtina gilînameya Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê piştrast kiribû.

Navendê, her wiha, li gel hin hevparên navdewletî berê xwe da dadgehên Rûsyayê û li dij endamên Kompanîya Wagnerê gilî kir. Van endaman tawan li hember welatîyên Sûrîyayê pêk anîbûn. Piştî ku gilînameyê hemû pileyên darizandinê li dadgehên Rûsyayê derbas kirin û tişt bi dest nexist, kompanîyê gilînameya xwe rakir Dadgeha Ewropayî ya Mafên Mirovan.

---

10 Mohamad Misto, Ethem Emre Özcan, "Iran boosting Yemeni Houthis with Syrian fighters: Local sources", Anadolu Agency, 07 May 2021, https://www.aa.com.tr/en/middle-east/iran-boosting-yemeni-houthis-with-syrian-fighters-local-sources/2233092#

11 Nabil Abdullah al-Tamimi, "IRGC smuggles foreign fighters into Yemen", Diyaruna.com, 28 Jul 2021, https://diyaruna.com/en_GB/articles/cnmi_di/features/2021/07/28/feature-01

12 إبراهيم الجبين، "إيران تعزّز الثقة مع العرب بتجنيد مرتزقة سوريين في اليمن"، العرب نيوز، 1 حزيران 2022, https://tinyurl.com/z7tk4u3x

13 Di wan Vîdeoyan de ku li ser rûpelên medyaya civakî hatibûn nîşandan, ev berguman li xwe mikur hatibû ku ew endamekî milîsa El-Heşd El-Şe'bî bû, di nav vê milîsê de li Sûrîyayê -li alîyê çekdarên Rêjîma Sûrîyayê- şer kiribû, welatîyên Sûrîyayê kuştibûn û gelek binpêkirirnên giran kiribûn. Her wiha wî anîbû zimên ku wî gelek zarokên Sûrîyayî yên ku nayên hejmartin kuştine. Wî gotibû ku wî zarokekî yekmehî di hembêza dayika wî ya bihawar de kuştiye. Di wan vîdeoyan de, wî gefa kuştinê li welatîyên Sûrîyayê yên li Norweçê rûniştî dixwar. "Gilînameya Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê li dij pêşendamekî milîsa El-Heşd El-Şe'bî", Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê, 22yê Tebaxa 2023yan, https://scm.bz/the-syrian-center-for-media-and-freedom-of-expression-files-a-complaint-against-a-former-member-of-the-popular-mobilization-forces-militia

# Yekem: Komên Çeteyan li Sûrîyayê

## 1. Danasîna Çeteyan

Peyva çete (çekdarê kirêgirtî) û danasîna wê ya li gor qanûna navdewletî, cara pêşîn di Danezana Den Haagê ya sala 1907an[14] re derbas bûye. Paşê, danasînên dadgerî yên vê peyvê, li Dadgeha Lûandayê[15] ya sala 1976an û Komîteya Navdewletî ya Lêpirsînê ya Angolayê[16] ya sala 1985an dewam kiriye. Danasînên peyvê, di nav Lihevkirina Rêxistina Yekîtîya Afrîkayî ya Qedexekirina Çetetîyê û Peymana sala 1989an a Neteweyên Yekbûyî ya têkoşîna li dij leşkerkirin, fînansekirin û perwerdekirina çeteyan de jî dewam kiriye. Sih û heft dewletan ev peyman îmze kir, di nav de çar dewletên Erebî (Qeter, Lîbya, Erebistana Si'ûdî[17] û Sûrîya[18]) hene. Sûrîya, 23.10.2008an, tev li vê peymanê bû. Jixwe gelek biryarên din ên qedexekirina bikaranîna çeteyan ji hêla Encumena Aborî û Civakî[19], Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî[20] û Encumena Navdewletî ya Ewlehîyê[21] ve hatine dan.

Benda 47em a protokola yekem a lihevkirinên Cenevê[22] kesê çete wisa dide nasîn:

A. Ji bo ku di nava şerekî çekdar de şer bike, tê leşkerkirin.

B. Bi awayekî pratîkî û rastrerast tev li pevçûnan dibe.

C. Ji bo bidestxistina berjewendîyeke kesane tev li şer dibe. Alîyekî şer an cîgirê alîyekî şer soza bedelekî darayî dide vî kesî ku tibaba vî bedelî gelekî zêde ye û ji mûçeya hevtayê wî yê xwedî heman pile di nav refên hêzên çekdar ên wî alîyî de pirtir e.

D. Ne welatîyê tu alîyekî şer e û ne jî niştecihê devereke li jêr serwerîya tu alîyê şer e.

14 Benda 4em: "Desteyên çekdaran pêk nayîne û ji bo alîkarîya alîyên şer jî tu nivîsgehên peywirdarkirina çekdaran li ser erda dewleteke bêalî venake." Benda 5em: "Dewleta bêalî rê nade ku ew kirinên di bendên 2 û 4em de hatine destnîşankirin, li ser erda wê bên pêkanîn. Lê belê eger ev kirin li ser erda wê pêk nehatibin, sizakirina kirdarên van kirinan jê nayê xwestin."

15 George H. Lockwood, Report on the Trial of Mercenaries: Luanda, Angola - June, 1976,1977, CanLIIDocs 48, Manitoba Law Journal, https://tinyurl.com/34h647y2

Daraza ku di 28ê Hezîrana 1976an de li barê darizandina 13 çeteyan, çete wiha da nasîn: "Kesê biyanî yê ku hêzê ji bo berjewendîyên xwe yên kesane bi kar tîne da ku li pêş tevgera gel a ji bo mafê çarenivîsê bibe asteng û bi vî awayî planên dagirkerîya nû disepîne."

16 Peymana Rêxistina Yekîtîya Afrîkayî ya Qedexekirina çeteyan a sala 1977an: "Çete ew kes e ku li ser asta xwecihî yan navdewletî, da ku di şerekî çekdar de şer bike, tê bijartin û bi awayekî rasterast tev li pevçûnan dibe. Ev kes ji bo qezenckirinê tev li şer dibe û pirê caran soza bedelekî darayî di ber şerkirinê re jê re hatiye terxankirin." https://tinyurl.com/sa5bcw78

17 International Convention against the Recruitment, Use, Financing and Training of Mercenaries, adopted in New York, 4 December 1989, entered into force 20 Oct 2001, https://treaties.un.org/Pages/ViewDetails.aspx?src=IND&mtdsg_no=XVIII-6&chapter=18&clang=_en

18 Çavkanîya derbasbûyî.

19 Biryara 1986/43yan a Encumena Aborî û Civakî ya ku zêdebûna leşkerkirina çeteyan, fînansekirin, komkirin, veguhastin û bikaranîna wan şermezar kirin.

20 Biryara 41/102yan a sala 1986an a der barê çeteyan de; wekî amyareke binpêkirina mafên mirovan û astengkirina bikaranîna gelan a mafê çarenivîsê. Her wiha biryara 49/150yî ya sala 1994an

21 Biryara 507an a sala 1982yan a girêdayî tawanbarkirina her dewleteke ku rê dide leşkerkirina çeteyan û hêsankirina xebatên wan ên têkbirina hikûmeteke endam a Neteweyên Yekbûyî. Her wiha biryara 1467an a sala 2003yan a girêdayî daxuyanîya li barê çekên sivik û piçûk, çalakîyên çeteyan û metirsîyên li ser aştî û ewlehîyê li rojavayê Afrîkayê.

22 Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor, Pêveka/Protokola Yekem a ku li Peymanên Cenevê yên sala 1977an hatiye zêdekirin.

https://www.icrc.org/ar/resources/documents/treaty/protocol-i-additional-to-the-geneva-conventions

E. Ne endamekî hêzên çekdar ên tu alîyê şer e.

F. Bi rêya peywireke fermî ya ji hêla hêzên çekdar ên dewleteke ku ne alîyekî şer e nehatiye hinartin.

Jixwe pisporên dadmendîyê rexne li protokolê girtin ku berjewendîya madî xist çarçoveya pereyan bi tenê, çimkî li gor Komîteya Navdewletî ya Lêpirsînê ya Angolayê[23], sedemên şerkirinê ji qezenckirina pereyan biwêdetir in û gelek caran sedem û handerên din hene; mîna hezkirina beşdarîya di serpêhatî û xirabkarîyê de, bêkarî, kêşeyên derûnnasîyê û têkçûna civakî[24].

# 2. Komên Çeteyan ên Girêdayî Îranê

Li Sûrîyayê, di warê bikaranîna çeteyan de, Îran pêşneg e. Ji bilî Pasdarên Îranê yên ku bi rengekî rasterast dest werdan şerê li Sûrîyayê û li alîyê hêzên hikûmetî şer kirin, milîsên xwecihî û biyanî li jêr serwerîya Tehranê li Sûrîyayê şer dikin. Beşeke van milîsan mercên qanûnî yên çetetîyê pêk tîne. Piranîya çekdarên Ne-Ereb, Efxan û Pakistanî ne. Îran wan bi hêsanî û erzanî dike leşkerên xwe. Wan ji nav penaberên Efxan ên li Îranê dibijêre û dixe jêr sîwana komên çekdar ên Iraqê, yan hin komên têvel saz dike, yan jî komên çekdar ên tam Efxanî yên wekî "Parartêşa Fatimîyûn" an jî tam Pakistanî yên wekî "Alayîya Zeynebîyûnê" saz dike.

## 2.1. Çarçoveyeke Giştî ya Çeteyên Îranê li Sûrîyayê

Geh li jêr dirûşma liberxwedanê geh jî li jêr silogana parastina deverên pîroz, Îranê milîs û komên xwe yên çekdar ên sînorderbas ava kirin. Van koman hêzeke xurttir li seranserê herêmê da Îranê. Di vî warî de, ji bo berdewamkirinê, Îran xwe dispêre kategorîyên curbicur ên çekdarên ku rola wan di çarçoveya welat û dewletên wan de namîne, lê belê hin caran digihêje dewletên ku Îran bi rêya çeteyan şerê wan dike. Li gor gotina wezîrê berê yê saloxgerîya Îranê, Heyder Mislihî[25], "êdî Îran serwerîyê li çar paytextên Erebî dike". Jixwe cîgirê serkêşê Pasdarên Îranê, General Huseyn Selamî[26] jî ev yek bi rengekî din dubare kir û got ku "berpirsên Îranê pêşbînî nedikir ku "Şoreşa Îslamî" bi vê lezgînîyê li derveyî welêt, ji Iraqê heta bi Sûrîya, Libnan, Filistîn, Behreyn, Yemen û Efxanistanê berbelav bibe." Wekî din, Elî Yûnisî[27] ku şêwirmendê serokê berê yê Îranê, Hesen Rûhanî bû, got ku "Îran vegerîya halê xwe yê berê dema împeratorî bû" û dîyar kir ku êdî Iraq paytexta vê împeratorîyê ye. Di heman çarçoveyê de, Sergeneral Ismaîl Qaanî[28] yê ku berê cîgirê serkêşê Parartêşa El-Qudsê bû, got ku "Îran di fetihkirina welatên deverê de berdewam e û piştî vegirtina Efxanistan, Iraq, Sûrîya û Filistînê, Îran hêza xwe dikişîne welatên din ên herêmê."

---

23 Komîte û dezgehên lêpirsînê, Neteweyên Yekbûyî - Encumena Ewlekarîyê.
https://www.un.org/securitycouncil/ar/content/repertoire/commissions-and-investigative-bodies

24 حمد العسيلي محمد، المركز القانوني لأسرى الحرب في القانون الدولي الإنساني، دار المعارف، 2005

25 https://tinyurl.com/rt3z3kjh،صالح حميد، "وزير إيراني سابق: نسيطر على 4 عواصم عربية"، العربية.نت، 2 نيسان 2015

26 https://tinyurl.com/bde6es4p،مسؤول إيراني كبير: لم نتوقع هذا التمدد السريع لنفوذنا"، الجزيرة.نت، 15 آذار 2015"

27 مستشار روحاني: إيران إمبراطورية عاصمتها العراق، ونحمي المنطقة من الوهابيين والعثمانيين الجدد والإلحاد"، سي أن أن بالعربية، 9 آذار 2015 "، https://arabic.cnn.com/world/2015/03/09/iran-iraq-younesi

28 https://tinyurl.com/4xffkzyk، نائب قائد فيلق القدس الإيراني يعترف: الحوثيون تربوا على أيدينا!"، صحيفة المواطن، 25 أيار 2015"

Milîsên Îranê ji Gulana 2011an ve li Sûrîyayê bi cih bûne, ango piştî meh û nîvekê ji destpêkirina pêla xwepêşandanên li dij Hikûmeta Sûrîyayê. Tehranê herî zêde xwe spart komên çete û milîsan[29] û bi rêjeyeke kêmtir hêzên ewlekarî û yên leşkerî yên xwecihî yên diketin jêr çavdêrî û serperiştîya rasterê ya Pasdarên Îranê. Sala 2014an, lêkolîneke Tora Sûrîyayî ya Mafên Mirovan eşkere kir ku hejmara çekdarên komên çeteyên girêdayî Îranê ne kêmî 35 hezar çekdaran e[30]. Heman lêkolînê dîyar kir ku hejmara pasdaran jî 5 hezar e û di nav 12 kom û parartêşan de hatine birêxistin[31]. Sala 2018an, gava operasyonên leşkerî hebekî kêm bûn, hejmara van çekdaran jî pê re kêm bû[32]. Hejmara wan heta radeyekê wekî xwe ma. Jixwe li gel ku gelek kuştîyên wan jî çêdibûn, lê dîsa jî Îranê karî -bi rêya leşkerkirina bi handana dînî yan bi rêya pere û peymanên rasterast ên li gel çekdaran[33]- hejmara çete û çekdarên xwe zêde bihêle. Şandîyê taybet ê Neteweyên Yekbûyî bo Sûrîyayê, Staffan de Mistura[34], sala 2015an texmîn kir ku Tehranê salane nêzî 6 mîlyar dolar li ser alîkarîyên darayî û leşkerî yên bo Hikûmeta Sûrîyayê xerc kirine.

Behaneya Îranê ya desttêwerdana di Sûrîyayê de parastina deverên pîroz bû[35]-[36], nemaze Gora Stî Zeynebê li gundewarê Şamê. Li wir, Îranê pasdarên xwe û komên çeteyan bi cih kirin, lê di rastîyê de wê şerê çekdarên opozisyonê yên li seranserê welêt kir; ku tu deverên pîroz ên Şîîyan li wir nînin. Van çekdaran tawanên şer li hember sivîlan pêk anîn[37] û di planên guhartinên demografîk de ku hîna li Sûrîyayê berdewam in, roleke sereke gerandin. Di vî milî de, li başûrê Şama paytext, piştî dorpêçeke asê li ser bajarokên derdora bajarokê El-Seyida Zeynebê, komên Ebû El-Fedil El-`Ebas, El-Qîyada El-`Amma, Hizbullah, Alayîya Bedirê û Alayîya Esedullah El-Xalib bajarokên Hicêra, El-Zîyabîya, Bebêla û El-Huseynîya dan ber xwe. Wan xelkê sivîl ê mayî qewirand û ev dever kirin navenda komên çeteyên xwe û malbatên wan[38]-[39].

Hin raporên Ewropayî[40] dîyar dikin ku avahîya Rêberîya Giştî ya li Firokexaneya Navdewletî ya Şamê, navenda Tehranê ya birêvebirina operasyonên leşkerî û komên çeteyan e. Çekdar û çeteyên Îranê[41] ji devera El-Seyida Zeynebê ya li gundewarê Şamê heta bajarokê Dareyyayê

29 Navvar Saban, "Factbox: Iranian influence and presence in Syria", Atlantic Council, 5 Sep 2015, https://www.atlanticcouncil.org/blogs/menasource/factbox-iranian-influence-and-presence-in-syria/

30 الميليشيات الشيعية في سورية"، الشبكة السورية لحقوق الإنسان، 5 تموز 2014"، https://snhr.org/arabic/2014/07/05/1578/

31 الميليشيات الشيعية المقاتلة في سوريا"، الجزيرة.نت، 6 كانون الأول 2015"، https://tinyurl.com/2s4h25jy

32 فيليب سميث، "إيران تتفوق على الأسد في السيطرة على الميليشيات الشيعية في سوريا"، معهد واشنطن لسياسات الشرق الأدنى، 12 نيسان 2018، https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/ayran-ttfwq-ly-alasd-fy-alsytrt-ly-almylyshyat-alshyyt-fy-swrya

33 منار حداد، "تمويل ميليشيات إيران في سوريا، هل تتيح العقوبات النفطية أفضلية للميليشيات الروسية؟"، إيران وير، 14 آذار 2020، https://iranwire.com/ar/reports/86708/

34 Babak Dehghanpisheh, "Iran recruits Pakistani Shi'ites for combat in Syria", Reuters, 10 Sep 2015, https://www.reuters.com/article/us-mideast-crisis-syria-pakistaniran/iran-recruits-pakistani-shiites-for-combat-in-syria-idUSKBN0TT22S20151210/

35 محمد السلمي، "إيران وعسكرة التشيع في الداخل والخارج"، مجلة السياسة والاقتصاد، جامعة بني سويف، تموز 2021، https://jocu.journals.ekb.eg/article_181405.html

36 عمر بهرام أوزديمير، "الميليشيات المدعومة من إيران في سورية: الملامح والوظائف"، مركز حرمون للدراسات المعاصرة، 20 تشرين الثاني 2022، https://tinyurl.com/6ncwsm94

37 "Hezbollah and Iran-handled Shi'ite militias are integrated into the Syrian army in its campaign to take control of south Syria", The Meir Amit Intelligence and Terrorism Information Center, 9 Jun 2018, https://www.terrorism-info.org.il/app/uploads/2018/07/E_174_18.pdf

38 Martin Chulov, "Iran repopulates Syria with Shia Muslims to help tighten regime's control", The Guardian, 14 Jan 2017, https://www.theguardian.com/world/2017/jan/13/irans-syria-project-pushing-population-shifts-to-increase-influence

39 الهندسة الديمغرافية في سوريا: نتيجة للحرب أم سبب لها"، المركز السوري للإعلام وحرية التعبير، تشرين الثاني 2022،" (إنجليزي) https://scm.bz/demographic-engineering-in-syria-ar/

40 Scott Lucas, "The Glass House: Iran's Operations Center", Syria Daily, 3 Jun 2020, https://eaworldview.com/2020/06/syria-glass-house-iran-operations-center/

41 خالد المطلق، "الميليشيات التي تديرها إيران في سورية"، مركز حرمون للدراسات المعاصرة، 29 كانون الأول 2020، https://tinyurl.com/5cjt8bsn

yê ber bi rojava ve û heta bi rojavayê bajarokê El-Kiswayê bi cih bûne. Her wiha li ser rêya navbera Şamê û sînorê Iraqê ji hêla rojhilat ve, di nav de deverên Dimêrê, Firokexaneya El-Sîn a Leşkerî, devera Sebi' Bîyar heta bi Dergehê Bûkemalê ya sînorî. Wekî din, hin milîsên Îranê li Firokexaneya Şi'êratê ya Leşkerî, Firokexaneya T-4ê, Firokexaneya Helebê, navendên lêkolînên zanistî (nemaze li deverên Cemraya, Sebûra û Berzê El-Beled ên gundewarê Şamê), li devera Misyafê ya gundewarê Hemayê, derdora Sazîya Karxaneyên Berevanîyê yên li devera Sifêrayê ya nêzî Helebê, li Navenda Yekbûyî ya Başûrî ya nêzî Dimêrê, Navenda Yekbûyî ya Bakurî ya nêzî bajarê Himsê û Odeya Operasyonên Beravê ya nêzî bajarê Banyasê. Lê devera ku milîsên Îranê bi pirbûn lê bi cih bûne, sêgoşeya bi rûbera 7 km2 [42] a navbera gundewarê Şamê, gundewarê Der'ayê û gundewarê Qinêtrayê ye. Ev çekdar û milîs li leşkergehên li Îran û Sûrîyayê tên perwerdekirin.

Sibata 2017an, Rêxistina Micahîdên Gel ên Îranê[43] ya ku Îran wê wekî rêxistineke "terorîst" bi nav dike, raginad ku 12 navendên perwerdekirina çeteyan li ser erda Îranê hene. Rêxistinê got ku "Pasdarên Îranê birêveberîyeke mezin di nav Parartêşa Qudsê de damezrandiye. P. Qudsê destê Îranê yê dirêj ê li derveyî sînor e û armanca wê ew e ku stratejîya Rêjîma Îranê bi rêya desttêwerdanên li derveyî welêt xurt bike, nemaze li dewletên herêmê yên mîna Sûrîya, Iraq, Yemen, Behreyn û Efxanistanê. Di vî warî de jî, ew çeteyên biyanî yên Îranê perwerde dike." Leşkergeh[44]-[45]-[46] jî ev in:

1. Leşkergeha El-Îmam Elî ya Perwerdeya Teorîk.
2. Leşkergeha Loşanê ya perwerdeyên taybet.
3. Navenda Badîne Boramîn a Perwerdeyên di Nava Bajaran de.
4. Leşkergeha Cemranê ya Taybet bo perwerdekirina endamên Efxan û şandina wan bo Sûrîyayê.
5. Navenda Emel (Kampa Malik Eşter) a perwerdekirina di nav şert û mercên dijwar de.
6. Navenda Mes'ed Hewaiî bo perwerdekirina hêzên taybet.
7. Navenda Semnanê ya perwerdekirina pratîkî ya barandina moşekan.
8. Navenda 'Ebadanê ya perwerdekirina binavbûnê.
9. Navenda Meşhedê ya perwerdekirina endamên Efxan.
10. Navenda Cezîret Qeşem a perwerdekirina şerê di nava bajaran de.
11. Navenda Bazokê ya perwerdekirina endamên Efxan.
12. Navenda "Mirsad" Şîraz a perwerdekirina çekdarên biyanî.

42 "الميليشيات الشيعية في سورية"، الشبكة السورية لحقوق الإنسان، 5 تموز 2014، https://snhr.org/arabic/2014/07/05/1578/

43 Arabic.mojahedin.org/

44 Eric Shawn, "Opposition group claims Iran sponsoring new terror training camps", Fox News, 15 Feb 2017, https://www.foxnews.com/politics/opposition-group-claims-iran-sponsoring-new-terror-training-camps

45 صالح حميد، "هذه مراكز تدريب الحرس الثوري الإيراني للميليشيات"، العربية.نت، 20 أيار 2020، https://tinyurl.com/3s63d99e

46 "معسكرات الحرس الثوري الإيراني لتدريب الإرهابيين في العالم: تقرير مفصل"، يمن برس، 18 كانون الثاني 2021: http://cutt.us/6t0vO

Komên çeteyan li nav leşkergehên Sûrîyayê jî tên perwerdekirin. Ev leşkergeh û navend ev in[47]:

* Leşkergeha Ye'fûrê ya li gundewarê Şamê ku li pêgeheke leşkerî ya Parartêşa Çarem a Sûrîyayê hatiye avakirin.
* Leşkergeha El-Seyida Zeynebê ya li gundewarê Şamê.
* Leşkergeha Dibistana Meyselûnê ya girêdayî Saloxgerîya Leşkerî ya Sûrîyayê.
* Leşkergeha Nechayê ya girêdayî Ewlekarîya Dewletê ya Sûrîyayê.
* Leşkergeha Şehîd El-Mihrab a bajarê Helebê.
* Leşkergeha El-Zehrayê ya bajarê Helebê.

Çeteyên Îranê bi rêya firokexaneyan û dergehên sînorî yên di navbera Sûrîya û Libnanê û Sûrîya û Iraqê de ref bi ref derbasî nava Sûrîyayê dibin. Geh bi navê hecîyan, geh bi navê serîlêderên ziyaretgeh û meqamên Şîî, geh jî bi rêya peymanên kar ên sexte da ku bi hêsanî ji welatên xwe derkevin. Carinan jî bi pasportên Sûrîyayî yên ku ji Birêveberîya Koçkirinê û Pasportan a Şamê[48] tên derxistin derbasî Sûrîyayê bûne.

Di havîna 2018an de, li gor lihevkirinekê, Artêşa Sûrîyayê û hevalbendên wê başûrê Sûrîyayê kontrol kir. Vê lihevkirinê lihevkirineke din[49] a ku di Çirîya Paşîn a 2017an de di navbera Urdun, Rûsya û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de hatibû îmzekirin temam dikir. Li gor lihevkirina 2017an, rê nayê dayîn ku hêzên biyanî derbasî parêzgehên Der'a û Qinêtrayê bibin. Di encamê de, milîsên Îranê yên li başûrê Sûrîyayê xwe ji nû ve belav kir[50] û berê xwe dan baregehên Îranê yên li navend û rojhilatê Sûrîyayê.

Li hêla din, Hêzên Îranê û milîsên wê zorî da leşkerkirina Sûrîyayîyan da ku mana xwe ya li herêmê mayîndetir bikin. Li vir jî tirs heye ku Îran vê siyaseta[51] han ji bo parastina pêgehên xwe yên li herêmê dimeşîne û di vê çarçoveyê de sermayeyeke civakî ya ji leşker, pêgir, mûçegir û kesayetên civakî yên girêdayî xwe ava dike. Girêdayî vê mijarê, lêkolîneke Navenda Heremonê ya Lêkolînan[52] dîyar kiriye ku Îranê malbatên pasdarên xwe han dane ku bar bikin Sûrîyayê û li parêzgeha Şamê û parêzgehên din ên Sûrîyayê niştecih bibin. Ev yek jî li gor qanûnên xanûberî û milkanîya biyanîyan[53] ên nû li Sûrîyayê pêkan e. Wekî din, Îranê -di milên

47 حاتم الفلاحي، "الميليشيات العراقية في سوريا: الدور والمستقبل"، الجزيرة.نت، 1 نيسان 2019، https://studies.aljazeera.net/ar/reports/2019/04/190401092356143.html

48 التمدد والاحتلال الشيعي الخفي في سوريا"، وسط للبحوث والدراسات، 4 نيسان 2022"، https://wassatsy.org/1336/

49 مناطق خفض التصعيد: إستراتيجية روسيا في حسم الصراع السوري عسكرياً"، المركز العربي للأبحاث ودراسة السياسات، 4 تموز 2018"، https://www.dohainstitute.org/ar/PoliticalStudies/Pages/De-escalation-Zones-Russian-Strategy-Military-Victory-Syria.aspx

50 مواقع القوى الخارجية جنوب سورية"، جسور للدراسات، 24 تشرين الثاني 2023"، https://tinyurl.com/2w6vknnm

51 توسيع دائرة الاختراق: أدوات التغلغل الإيراني وحساباته في مناطق الجنوب السوري"، مركز الإمارات للسياسات - وحدة دراسات المشرق العربي، 20 أيلول 2022"، https://epc.ae/ar/details/brief/adawat-altaghalghul-alirani-wahisabatuh-fi-manatiq-aljanub-alsuwri ؛ إيدو ياهيل، "إيران في سورية: من التمدّد إلى التحصّن"، مركز حرمون للدراسات المعاصرة، 30 تشرين الثاني 2021، https://tinyurl.com/2vebf9br ؛ "أثر السياسة الاقليمية الايرانية على الأمن القومي العربي"، المركز الديمقراطي العربي، 12 تموز 2016، https://democraticac.de/?p=33848

52 إيدو ياهيل، "إيران في سورية: من التمدّد إلى التحصّن"، مركز حرمون للدراسات المعاصرة، 30 تشرين الثاني 2021، https://tinyurl.com/2vebf9br

53 Serrastkirina qanûna 11an a sala 2021ê ya li barê milkanîya xanûberan ji hêla kesên Ne-Sûrîyayî yên li Sûrîyayê. Her wiha qanûna 25an a sala 2013an a li barê serrastkirina qanûna rêûresmên darizandinên sivîl ku êdî pêhesandina kesê dozlêkirî bi rêya rojnameyekê yan danezannameya dadgehê tê pejirandin. Vê yekê rê da Hikûmeta Sûrîyayê ku milkanîya erd û xanûberên dijberên hikûmetê -bêyî agahdarkirina wan- biguhêre.

civakî û çandî de jî- xwe berdaye nava civaka Sûrîyayê û êdî mezheba Şîî li gor rêbaza Îranê (mezheba Wîlayeta Feqî) berbelav dike û xwe ber bi sektora hînkirinê ve radide, çimkî êdî 6 zanîngehên Îranê li Sûrîyayê hene[54] û navendên wê yên fêrkirina zimanê Farisî jî pir zêde bûne.

## Leşkerkirina Zarokan

Di çarçoveya leşkerkirina zarokan de, Komara Îslamî ya Îranê siyaseteke fermî, hema hema eşkere û bi rênîşandêrîya Rêberê Bala yê Komarê[55] digerîne ku li pêş girseyeke mamostayan gotibû: “36000 xwendekarên me di berevanîya pîroz a Şerê Iraq-Îranê yê salên 1980-1988an de şehîd bûn û eger ne ji giyanê geş ê mamostayan bûya, xwendekar dê neçûna rêzên pêşîn ên şer.”

Di rêza pêşîn de, prosesên leşkerkirinê di nav penaberên Efxan de berbelav in[56]. Di sala 2017an de, Rêxistina Human Rights Watchê[57] Pasdarên Îranê bi leşkerkirina zarokan tawanbar kir. Rêxistinê dîyar kir ku Parartêşa Fatimîyûn a girêdayî Îranê zarokên Efxan ên ji 14 salî û mezintir ji bo şerê li Sûrîyayê dike leşker û pere û rêdanên mayîna li Sûrîyayê bo wan û malbatên wan dabîn dike. Rêxistinê eşkere kiriye ku behaneya leşkerkirinê jî -li gor daxuyanîyên fermî- parastina mezarên li Sûrîyayê ye. Leşkerkirin bi rêya Desteya Besîcên Şagirdan[58] jî pêk tê. Di hêla teorîk de, çalakîyên vê desteyê di çarçoveya perwerdekirin û hînkirinê de ne, lê belê di rastîyê de, li gor lîsteya 2018an a sizayên Nivîsgeha Çavdêrîya Çavkanîyan a girêdayî Gencîneya Amerîkayê ya ku li ser sazîyên Îranê ên ku karê leşkerkirinê dikin hatiye sepandin, ev desteya şagirdan, navendeke leşkerkirina zarokan a ji bo Pasdarên Îranê ye.

Di heman çarçoveyê de, Îran zarokên Sûrîyayî hand dide ku tev li çalakîyên leşkerî bibin. Di vî warî de, Îran hewl dide vê rewşê li ser erdê bike rastî û hêza xwe di nav civakê de xurt bike. Li gor ajansên xwecihî[59], di nava vê planê de, Îranê şeş navendên perwerdekirina şer bo zarokên jêr temenê 16 salîyê vekirine[60] û wan di perwerdekirina çekan û rênîşandêrîya leşkerî û îdeolojîk re derbas dike. Ev navend jî ev in:

* Leşkergeha El-Şêbanî ya li bakurrojavayê Şamê. Ev leşkergeh ji hêla Hizbullaha Libnanî ve tê parastin[61].
* Leşkergeha Milîsên Alayîya Qudsê ya li devera Nêrebê ya li rojhilatê parêzgeha Idlibê û zarokên Filistînî û Sûrîyayî lê tên perwerdekirin.
* Leşkergeha li bajarokê Qisêr ê başûrê parêzgeha Himsê ya ku ji hêla Hizbullah ve tê birêvebirin.

---

54 "سادس جامعة إيرانيّة في سوريا: تعميق التّسلل إلى العقول"، النهار العربي، 13 أيار 2022، https://www.annaharar.com/arabic/news/arab-world/syria/12052022030234729

55 Ali Ranjipour, “Iran Grooms Child Soldiers Across the Country”, 10 Feb 2020, IranWire, https://iranwire.com/en/features/66696/

56 "إيران: تجنيد أطفال أفغان للقتال في سوريا"، هيومن رايتس ووتش، 1 تشرين الأول 2017، https://www.hrw.org/ar/news/2017/10/01/309238

57 Heman çavkanîya borî.

58 "تجنيد الأطفال في إيران: ماذا تعرف عن مؤسسة باسيج التلاميذ؟"، الحرة، 12 شباط 2020، https://tinyurl.com/43f8efn7

59 "كشافة إيران: معسكرات لتجنيد أطفال سوريا"، أنا برس، 28 شباط 2020، https://tinyurl.com/593ajs4t

60 "شبكة تكشف عن مراكز تجنيد الأطفال من قبل إيران في سوريا"، إيران إنسايدر، https://tinyurl.com/33zkjxhp

61 "حزب الله اللبناني يقود حملة كبيرة لتجنيد أطفال دير الزور ويتمكن من استقطاب أكثر من 200 طفل مستغلاً الأوضاع المعيشية"، المرصد السوري لحقوق الإنسان، 14 كانون الأول 2023، https://tinyurl.com/2myya92t

* Leşkergeha Meyadînê ku li jêr serperiştîya efserên Pasdarên Îranê û milîsên Iraqê ye.
* Leşkergeha Dêra Zorê ya ji sê şaxan; yek li Taxa El-Cûrayê, a duyem li devera Eyn Elî ye û ya sêyem li Taxa El-Qisûrê ye.
* Leşkergeha Bûkemalê.

Tam li devera rojhilatî ya Sûrîyayê û gundewarê rojhilatî yê Reqayê, milîsên Îranê keysa xwe li rewşa aborî ya xirab a malbatên deverê tînin da ku zarokan bikin leşkerên xwe[62]. Wekî din, ji sala 2011an ve, Rawêjkarîya Çandî ya Îranê ya Sûrîyayê çend liqên Sazîya "Rêçgerîn"ê li Sûrîyayê vekirin. Ev sazî wekî rêxistineke perwerdekar tev digere ku xizmeta şagirdan "Rêçgerên Wîlayetê" yên li devera El-Seyida Zeynebê ya derdora Şamê û "rêçgerên" bajarê Dêra Zorê dike. Li gor lêkolîneke Navenda Heremonê ya Lêkolînan a bi sernavê "Sazîyên Desthilatîya Îranê li Sûrîyayê û Şêwazên Şîîkirinê"[63] "ev sazî xebateke berfireh dimeşînin: Ji lidarxistina pêşangeh û seyranan bo zarokan li deverên başûrê Şamê heta bi çalakîyên seyr ên ku li nav komeleyên zarokan pêk nayên; mînak: Komeleya Rêçgerên Îmamê Mehdî bi rengekî sîstematîk zarokan ji rê dibe: Wan li holên bi projektoran kom dikin û çîrok û fîlmên li barê "Nasibîyan" û giringîya hilanîna tola Huseyn kurê Elî şanî wan dikin. Her wiha hin aktor dîmeninan nîşan didin û derdikevin ser dikên şanoyên ku hin caran oldar jî lê amade dibin. Rûpelên medyaya civakî yên "rêçgeran" wêneyên meş û karwanên "Huseynî" bi par ve dikin ku di nav de zarokên bi cilên leşkerî hene ku alayên Îranê û wêneyên Xamineyî hilgirtine.

Lê belê çalakîyên herî sosret, perwerdeyên werzişî yên mîna perwerdeyên leşkerî yên yekîneyên leşkerî ne. Di vî warî de, komeleyê navendên taybet ên ku alavên xwehilavêtin, xişandin û rahînanên dijwar lê hene, amade kirine. Wer xuya ye ku ev perwerde û rahînan amadekirineke pêşwext a zarokan e da ku bibin leşkerên siberojê yên ku dê xizmeta "Îmamê Mehdî" bikin.

## 2.2. Komên Çeteyan ên Iraqî

Di Şerê Kendavê yê Pêşîn de[64], li gel ku ji heman mezhebî ne, Îranê nekarî leşkerên Şîî yên ku % 80ê Artêşa Iraqê pêk tanîn[65] ber bi xwe ve bikişîne. Hin kesayetên ji partîyên Şîî yên opozisyonê jî di vî milî de bi ser neketin, mîna serkêşê Rêxsitina Bedrê, Hadî El-'Mirî, yê ku li gel koma xwe mil bi milê Pasdarên Îranê şerê Artêşa Iraqê kiribû. Her wiha serkêşê Tabûrên Hizbullahê, Ebû Mihdî El-Muhendis, ê ku ji sala 1983yan ve li gel Pasdarên Îranê li Kuweytê kar kir û êrîş birin ser balyozxaneyên dewletên ku di şerê Iraq û Îranê de destek didan serokê berê yê Iraqê, Sedam Huseyn. Jixwe hin kesayetên din jî hebûn û gelek xelkê Iraqê ev yek wekî xayînîyeke gewre bi nav kir.

62 "المرصد: منظمة سورية مدعومة من إيران تستقطب شباب الرقة لتجنيدهم"، الحرة، 16 آب 2020، https://tinyurl.com/yc58jza5

63 حسام السعد، "مؤسسات النفوذ الإيراني في سورية وأساليب التشييع"، مركز حرمون للدراسات المعاصرة، 29 نيسان 2018، https://tinyurl.com/yshudmcs

64 Hikûmeta Iraqê navê "Qadisîyaya Sedam" li Şerê Kendavê yê Pêşîn an jî Şerê Iraq û Îranê kir, lê belê Îranê navê "Berevanîya Pîroz" lê kir. Vî şerî ji Îlona 1980yî heta 1988an dom kir û bêyî ku tu alî bi ser bikeve, bi agirbestê, bi dawî bû.

65 Laith Kubba, "Truth, War, and Consequences", FRONTLINE, PBS, 11 Sep 2003, https://www.pbs.org/wgbh/pages/frontline/shows/truth/interviews/kubba.html; Farhang Rajayi, "The Iran-Iraq war : the politics of aggression", University Press of Florida, Gainesville, 1993, https://search.worldcat.org/title/44958154

Piştî şerê DYAyê yê li dij Iraqê û têkbirina Rêjîma Beisê, kesayet û partîyên girêdayî Îranê ji sirgûnê vegerîyan û barê Îranê li welatê xwe danîn. Sedema vê jî ew bû ku valahîyeke siyasî hebû, çimkî siyasetên Be’isê partîyên siyasî bi darê zorê nehêlabûn û Be’is bi xwe jî li holê nemabû. Îcar partîyên dînî yên Şîî xelkê Şîî xist jêr bandora xwe û pê re sazîya dînî ya Îranê û saloxgerîya Îranê karekî berfireh meşand û herî zêde berê xwe dan xelkê hejar û tênegihaştî û Şîîyên din. Îranê teorîya çarenivîsa yekgirtî ya Şîîyên Iraq û Îranê berbelav kir û êdî ev hizira han ji ber pêwendîyên dîrokî û planên hînkirinê yên Îranê di nava civaka Şîî ya Iraqê de xurttir bû. Teorîya “Wîlayeta Feqî” ya Xumeynî hêla ku hejmareke mezin a Şîîyên Iraqê destekê bide siyasetên firehxwaz ên Îranê li herêmê û êdî komên çekdar ên Iraqî bûn alaveke vê siyaseta Îranê.

Ji nav van komên çekdaran ên girêdayî Îranê, hin çekdarên Iraqî navlêkirina “çetetîyê” heq dikin, lê Iraqîyên ku ji berî sala 2011an ve li Sûrîyayê diman û hejmareke wan bû endamên komên çekdar ên ku Îranê piştî sala 2011an ava kirin û kesên ku ji ber sedemên îdeolojîk û mezhebî tev li şer bûne, nakevin ber navlêkirina “çetetîyê”. Çekdarên din dikarin wekî “çete” bên binavkirin. Çekdarên pêşîn hevdemî xwepêşandanên gel ên 2011an gihaştin Sûrîyayê. Di nav milîsên ‘Esaib Ehil El-Heq a Iraqî ya bi serkêşîya Qeys El-Xez’elî de bûn. Hejmara wan nêzî 800 nîşanbazên perwerdekirî bû û pisporên baş ên şer bûn[66].

Îlona 2016an[67], bêhtirî 1000 çekdarên Iraqî berê xwe da Helebê da ku li gel 4000 çekdarên din ên Iraqî ku berê hatibûn, mil bi milên çekdarên hêzên Hikûmeta Sûrîyayê şer bikin. Van çekdaran nîvê çekdarên ku wê demê li wir şer dikirin pêk tanî. Çekdar bi rêya nivîsgehên Heşda Şe’bî yên li Iraqê tên pejirandin. Di vî warî de, dîndarên Şîî yên ku Îranî jî di nav wan de hene, leşkerkirinê dimeşînin û li hember vî karî mûçeyên mehane yên ji 300 heta 1500 $ werdigirin[68]. Li hêla din, Hikûmeta Sûrîyayê xwarin û cihê rûniştinê ji bo wan dabîn dike. Wezareta Veguhastin û Pêgihandinê ya Iraqê çeteyan ji firokexaneyên Bexda û Necefê -li jêr navê serdana deverên pîroz ên Şamê- digihîne Sûrîyayê.

**Ji nav komên çekdar ên Iraqî yên herî berbiçav li Sûrîyayê**:

## Alayîya Ebû El-Fedil El-‘Ebas

Sala 2012an li Sûrîyayê hatiye damezrandin da ku li gel hêzên Hikûmeta Sûrîyayê şer bike. Behaneya damezrandinê parastina Meqamê El-Seyida Zeynebê ya li gundewarê Şamê bû û bi fitûya ayînî ya hin dîndarên Şîî yên Necefê hatiye ragihandin. Welatîyên Iraqê para herî mezin a çekdarên vê alayîyê pêk tînin û piranîya wan tev li milîsên ‘Esaib Ehil El-Heq, Tevgera Sedrî û Tabûrên Hizbullahê yên Iraqê dibin. Welatîyên Sûrîyayê yên ji xelkê bajarokên Nubul û Zehrayê (yê herî navdar kesê bi navê Ebû ‘Ecîb ê ji bajarokê Nubulê ye) tev li vê alayîyê bûne, her wiha çekdarên ji Linbanê û ji dewletên Asyayê jî tev lê bûne. Hejmara çekdarên alayîyê nêzî 4800 çekdarî ye.




66 خالد المطلق، "الميليشيات التي تديرها إيران في سورية"، مركز حرمون للدراسات المعاصرة، 29 كانون الأول 2020، https://tinyurl.com/5cjt8bsn

67 Tamer El-Ghobashy, Maria Abi-Habib, “Iraqi Militias Complicate Aleppo Battle”, Wall Street Journal, 5 Oct 2016, https://www.wsj.com/articles/iraqi-militias-complicate-aleppo-battle-1475687051

68 حاتم الفلاحي، "الميليشيات العراقية في سوريا: الدور والمستقبل"، الجزيرة.نت، 1 نيسان 2019، https://studies.aljazeera.net/ar/reports/2019/04/190401092356143.html

Li gor Zanistnameya El-Cezîrayê, daxuyanîya 1ê ya damezrandina alayîyê di Kanûna Paşîn a 2013an[69] de, sedem û behaneya damezrandinê wekî “parastina Meqamê El-Seyida Zeynebê ji êrîşên gawirker û wehabî û kesên bi navê Artêşa Azad û dijminên merivên pêxemberê Xwedê” bû. Li gor serkêşekî alayîyê[70], endamên wî li Iraqê û li tu dereke din şer nekiriye û tenê ji bo şerê li Sûrîyayê hatine erkdarkirin. Wî her wiha destnîşan kiriye ku ew gotinên wan alîyên Sûrîyayî yên ku dibêjin ku ew girêdayî alayîya wî ne, ji rastîyê dûr in.

Sala 2021ê, li jêr serperiştîya serkêşîya alayîyê, koma bi navê “Tabûra Jinan”, bi rêya jineke nêzî ‘Ednan El-Si‘ûd (El-Zûzû) ku serkêşekî koma El-Fedil El-‘Ebas e, hat damezrandin. Hevjînên serkêşên alayîyê, hin jinên Rêçgerîna El-Mehdî û hin komeleyên bihawarçûnê yên ku Îran sponserîya wan dike di vê tabûrê de cih girtiye.

Endamên vê alayîyê mafên Sûrîyayîyan bi gelek rengan binpê kirin; ji kuştinê heta bi windakirin, îşkencekirin û girtina derqanûnî. Çekdarên alayîyê gelek komkujî jî li çend deverên Sûrîyayê pêk anîn, nemaze li Taxên Xalidîya û Baba ‘Emroyê yên Himsê, Taxa Beyyadayê ya Banyasê û Dareyya û bajarokên Xûtaya Rojhilatî[71]. Yek ji wan Komkujîya El-Nebikê[72] ya gundewarê Şamê bû ku di Kanûna Paşîn a 2013an de pêk hat û 362 kesên sivîl (di nav de 102 zarok û 92 jin) bûn qurbanîyên wê. Vê dawîyê jî, di 16.09.2023yan de, endamên çekdar ên alayîyê 3 kesên sivîl -dema ku diçûn karê xwe- li ber xaleke pişkinînê ya di navbera bajarokên Hicêra û El-Seyida Zeynebê yên gundewarê Şamê de girtin û ew ber bi cihekî nedîyar ve birin[73].

## Tevgera El-Nucebaiê ya Iraqî[74]




Sala 2013an, bi desteka Îranê, hatiye damezrandin. Ji hêla hizirî û îdeolojîk ve girêdayî Hizbullaha Libnanî ye, lê belê ji hêla rêxistinî ve jê cuda ye û girêdayî serkêşîya Parartêşa Qudsê ya Îranê ye. Bi navê Tevgera El-Nucebaiê derbasî Sûrîyayê bû û sê alayîyan (El-Hemed, El-Hesen El-Muctebî û ‘Emmar Bin Yasir) li xwe digire. Şêx Ekrem El-Ke‘bî serkêşîya van alayîyan dike û hejmara çekdarên wê di navbera 8 û 10 hezar çekdaran de ye. Sala 2016an, vê tevgerê di êrîşa hêzên Hikûmeta Sûrîyayê de ya bi palpiştîya balafirên şer ên Rûsyayê li ser Helebê roleke giring gerand.

Hin çekdar li gor bawerîyên xwe yên dînî yên xurt şer dikin,
lê belê piranîya wan xelkê Şîî yê xizan ê başûrê Iraqê ne ku mûçeyên mehane yên Îranê yên ku digihêjin 1500 $ gilêza wan diherikîne. Çekdarên Tevgera El-Nucebaiê bi rêya firokeyan

---

69 “لواء أبو الفضل العباس”، الجزيرة.نت، 10 كانون الأول 2014، https://tinyurl.com/4n3nkysc

70 “خلافات وسرقات تعصف بلواء أبو الفضل العباس العراقي في سوريا”، الخليج الجديد، 7 كانون الأول 2015، https://tinyurl.com/2p8tfa4

71 عبدالله الحايك، “لمحة عامة: لواء أبو الفضل العباس”، معهد واشنطن لسياسات الشرق الأدنى، 16 تشرين الثاني 2023، https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/lmht-amt-lwa-abw-alfdl-albas

72 “تسع سنوات على مجزرة النبك: مذبحة جماعية بدوافع طائفية”، عنب بلدي، 5 كانون الأول 2022، https://tinyurl.com/bdhnbbwm

73 الشبكة السورية لحقوق الإنسان على منصة إكس (تويتر سابقاً)، 19 أيلول 2023: “اعتقلت عناصر مسلحة من لواء أبو الفضل العباس الإيراني إحدى الميليشيات الموالية لقوات #النظام_السوري 3 مدنيين، من أبناء مدينة #دمشق، في 16-9-2023، لدى مرورهم من نقطة تفتيش تابعة لها بين بلدتي حجيرة والسيدة زينب في محافظة #ريف_دمشق، أثناء توجههم إلى عملهم، واقتادتهم إلى جهة مجهولة. تخشى #الشبكة_السورية أن يتعرضوا لعمليات تعذيب.”، https://tinyurl.com/5n7trcna

74 Babak Dehghanpisheh, “The Iraqi militia helping Iran carve a road to Damascus”, Reuters, 22 Sep 2017, https://www.reuters.com/investigates/special-report/mideast-crisis-iraq-nujaba/

-rasterast- ji Bexda yan Necefê diçin Şamê . Destpêkê, sê mehan li başûrê Iraqê perwerdeya çekên giran, top û çekên nîşangirîyê dibînin û hin ji wan li ber destê çekdarên Hizbullaha Libnanî tên perwerdekirin û paşê bi rêya derîyên sînorî yên bejayî derbasî Sûrîyayê dibin. Li Libnanê, perwerdeya rakirina mayînan, pêwendîdanîn û xebitandina dronan dibînin. Jixwe hin dronên ji markaya Yasirê ya Îranê li nik tevgerê hene. Wekî din, pereyên ku Îran dide Tevgera El-Nucebaiê rê da tevgerê ku kenaleke xwe ya televîzyonê ya bi navê Kenala El-Nucebaiê[75] bide destpêkirin. Ev kenal dîmenên şer ên ku bi pisporî hatine amadekirin û montajkirim û stranên leşkerî diweşîne da ku alîgirên xwe zêdetir bike.

Di 13.12.2016an de, berdevkê fermî yê Komîser Mafên Mirovan ê Neteweyên yekbûyî, Rupert Colville, Tevgera El-Nucebaiê bi nav kir û got ku çekdarên wê li gel hêzên Hikûmeta Sûrîyayê herî kêm 82 kesên sivîl (di nav de 11 jin û 13 zarok) li çar taxên cuda yên Helebê (Taxên Bistan El-Qesir, El-Firdos, El-Kellasê û El-Salihînê) kuştine[76]. Di Adara 2017an de, ji bo ku -bi behaneya şerkirina li dij Îsraîlê- hebûna Îranê -di siberojê de- li Sûrîyaya xurt bike, tevgerê Alayîya Rizgarkirina Colanê[77] damezrand. Di Adara 2019an de, DYAyê[78] ev tevger wekî tevgereke terorîst bi nav kir û danûstandina li gel wê qedexe kir.

**Ji nav milîsên Şîî yên Iraqî yên ku li Sûrîyayê şer dikin, ev jî hene**:

* Hêzên Şehîd Mihemed Baqir El-Sedir[79] "Baskê Leşkerî" yê Rêxsitina Bedrê ya ku şaxên xwe berdane kûrahîya erda dewleta Iraqê, gelek komên çekdar jê çêbûne û li ser asta damezrandinê, têkilîyên wê yên xurt li gel Pasdarên Îranê hene. Rêxistina Bedrê komên çekdaran hinartine Sûrîyayê da ku li jêr navê Hêzên Şehîd Mihemed Baqir El-Sedir li gel hêzên Hikûmeta Sûrîyayê şer bikin. Hejmara çekdarên wê ji 1500 heta 2000 çekdarî ye û li gelek deverên wekî El-Seyida Zeynebê û deverên başûrê Şamê şer kirine[80].




75 Heman çavkanîya borî.

76 "الأمم المتحدة: هناك مذبحة ضد المدنيين في حلب"، الجزيرة.نت، 13 كانون الأول 2016، https://tinyurl.com/8msxpeyh

77 فيليب سميث، "إيران تتفوق على الأسد في السيطرة على الميليشيات الشيعية في سوريا"، معهد واشنطن لسياسات الشرق الأدنى، 12 نيسان 2018، https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/ayran-ttfwq-ly-alasd-fy-alsytrt-ly-almylyshyat-alshyyt-fy-swrya

78 ما هي حركة "النجباء" العراقية المسلحة وما دورها؟"، بي بي سي عربي، 15 آب 2019، https://www.bbc.com/arabic/middleeast-46470444

79 Phillip Smyth, "Hizballah Cavalcade: Khamenei's Cannon: 50 Caliber Anti-Material Rifles & Shia Fighters in Syria", Jihadology.net, 24 Dec 2013, https://web.archive.org/web/20200311052704/https:/jihadology.net/category/quwet-al-shahid-muhammed-baqir-al-sadr/

80 مايكل نايتس، كريسبين سميث، حمدي مالك، "لمحة عامة عن منظمة بدر"، معهد واشنطن لسياسات الشرق الأدنى، 2 أيلول 2021، https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/lmht-amt-n-mnzmt-bdr

* Tabûrên Hizbullaha Libnanî[81]-[82]: Komeke leşkerî ye, di sala 2013an de gelek çekdarên xwe yên ku hejmara wan nêzî 7 hezaran e, hinartine Sûrîyayê. Haşim El-Hemdanî (Ebû Alai) serkêşîya wan dike. Ev hêza han desteka xwe ji Îranê digire û operasyonên xwe li gel Hizbullaha Sûrîyayî pêk tîne. Perwerdeya xwe ya leşkerî jî li Libnanê dike.
* ʿEsaib Ehil El-Heq[83]: Komeke leşkerî ya Iraqî ye. Gelek çekdarên xwe şandine Sûrîyayê û navendên wê li gundewarê Şamê û Bûkemalê hene. Ev koma han bi kuştina dîndarên Sunî yên Iraq û Sûrîyayê tê tawanbarkirin. Desteka xwe ya darayî ji hêla Îranê û serokwezîrê berê yê Iraqê, Nûrî El-Malikî ve, digire; her wiha ji revandina welatîyan û girtina pereyan li hember serbestkirina wan.
* Parartêşa El-Weʾid El-Sadiq[84]: Komeke çekdar a Iraqî ye ku Mihemed Hemza El-Temîmî (Ebû ʿElî El-Necefî) serkêşîya wê dike. Nêzî 2 hezar çekdarên wê li Sûrîya û Iraqê hene. Navenda wê ya Sûrîyayê li gundewarê Şamê ye û şerê xwe li Şam û Helebê dike. Vê dawîyê, endamên ji bajarokên Kefreyya û El-Foʾa û Meʾerret Misrînê yên Idlibê li xwe girtin.
* Seraya Telaiʾ El-Xuresanî[85]: Komeke çekdar a Iraqî ye ku sala 1984an hatiye damezrandin. Kesê bi navê ʿElî El-Yasirî wê bi rê ve dibe û wekî milê leşkerî yê Partîya El-Telîʾa El-Îslamî tê hesabkirin. Hejmara çekdarên wê yên li Sûrîya û Iraqê nêzî 5 hezaran e û destekeke darayî û leşkerî ji Îranê dibîne. Navenda wê ya sereke li Necefê ye û hin nivîsgehên wê yên din li Wasit, Kerbela û Besrayê li Iraqê û gundewarê Heleb û Şamê li Sûrîyayê hene. Erkekî wê yê sereke parastina Firokexaneya Şamê ya Navdewletî ye.

81 ؛ مايكل نايتس، حمدي https://tinyurl.com/5y4d72kt ،كتائب حزب الله في العراق"، المركز العربي لدراسات التطرف"
مالك، "الأمين العام لكتائب حزب الله يحاول منع الضربات الأمريكية في العراق أو إيران"، معهد واشنطن لسياسات الشرق
الأدنى، 30 كانون الثاني 2024، https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/alamyn-alam-l-ktayb-hzb-allh-yhawl-mn-aldrbat-alamrykyt-fy-alraq-aw-ayran

82 Joe Truzman, "Iran and its Network of Nineteen Terrorist Organizations on Israel's Borders", 1 Jul 2022, https://www.fdd.org/wp-content/uploads/2023/07/fdd-visual-iran-and-its-network-of-nineteen-terrorist-organizations-on-israels-borders.pdf

83 إبراهيم المقدادي، سالم الحميد، موسوعة إيران والتشيع السياسي، الجزء الأول، مركز المزماة للدراسات والبحوث، 2018،
ص 188؛ "مليشيا إرهابية: من هي عصائب أهل الحق ذراع النظام الإيراني الإجرامي؟"، منظمة مجاهدي خلق الإيرانية، 1 كانون
الثاني 2020، https://arabic.mojahedin.org/73503

84 كريسبين سميث، حمدي مالك، مايكل نايتس، "لمحة عامة عن ألوية الوعد الحق"، معهد واشنطن لسياسات الشرق
الأدنى، 1 نيسان 2021، https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/lmht-amt-n-alwyt-alwd-alhq ؛ حاتم
الفلاحي، "الميليشيات العراقية في سوريا: الدور والمستقبل"، الجزيرة.نت، 1 نيسان 2019، https://studies.aljazeera.net/ar/reports/2019/04/190401092356143.html

85 "إيران تعزز دور سرايا طلائع الخراساني في سوريا: ما أهدافها؟"، حفريات، 17 تشرين الثاني 2022، https://tinyurl.com/yknv3s5w
"سرايا الخراساني: تأسيس وولاء إيراني"، الشرق الأوسط، 10 حزيران 2016، https://tinyurl.com/2p8y3f9k

**Her wiha hin komikên çekdar ên Iraqî yên din hene, mîna**[86,87,88,89]**:**

* Tabûrên Seyid El-Şuhedai: Nêzî 700 çekdarî li xwe digire. Beşdarîya wê ya herî berbiçav di şerên devera El-Seyida Zeynebê û pevçûnên Xûtaya Rojhilatî de bû.
* Hêzên Esed El-Lah El-Xalib Fîl-Iraq Wel-Şam: Hejmara çekdarên wê nêzî 700 çekdarî ye.
* Milîsên Alayîya Zulfeqar: Nêzî 1000 çekdarî ye. Tev li şerên El-Seyida Zeynebê, Rêya Firokexaneyê, şerên ʻEdrayê û bajarê Nebikê bû.
* Alayîya Kefîl Zeynebê: Sala 2013an hat damezrandin û tev li şerên Xûtaya Rojhilatî, El-Seyida Zeynebê, Rêya Firokexaneyê, Qelemûn û Helebê bû.
* Tabûrên Heyder El-Kerrar (ʻEsaib Ehil El-Heq): Şaxê Sûrîyayê yê ʻEsaib Ehil El-Heq a Iraqî. Hejmara çekdarên wê 800 çekdar e.
* Tabûrên El-Îmam ʻElî: Navenda wê ya sereke li El-Seyida Zeynebê ye. Li bajarê Şamê û li ser sînorê Sûrîya-Iraqê jî hene. Hejmara çekdarên wê nêzî 1000 çekdarî ye.
* Seraya ʻAşûrai: Çekdarên wê li Şamê û gundewarê wê hene.
* Alayîya El-Mu'melê: Girêdayî Artêşa El-Mehdî ye. Çekdarên wê li Dareyya û El-Seyida Zeynebê ne.
* Alayîya El-Şebab El-Rîsalî: Çekdarên wê li Helebê û gundewarê wê ne.
* Alayîya Kefîl Zeynebê: Çekdarên wê li El-Seyida Zeynebê, Rêya Firokexaneyê, Xûtaya Rojhilatî, Heleb û Qelemûnê ne.
* Alayîya Esed El-lah El-Xalib: Çekdarên wê li gundewarê Şamê û Qidseyayê ne.

86 أحمد سلوم، "خريطة انتشار الميليشيات الإيرانية في سوريا والعراق"، إيران وير، 8 أيار 2020. https://iranwire.com/ar/reports/84061/#google_vignette

87 علي آلفونه، "الميليشيات الشيعية العراقية المتشرذمة في سوريا"، معهد دول الخليج العربية في واشنطن، 22 آب 2018. https://agsiw.org/ar/fractured-iraqi-shia-militias-in-syria-arabic/

88 "الميليشيات ومستقبل الدولة العراقية" (ملف)، مركز كارنيغي للشرق الأوسط - مؤسسة كارنيغي للسلام الدولي. https://carnegieendowment.org/sada/issue/1500?lang=ar

89 عبد الرؤوف مصطفى الغنيمي، "صراع الميليشيات والنفوذ الإيراني في العراق"، مجلة الدراسات الإيرانية، العدد الرابع عشر - تشرين الأول 2021. https://tinyurl.com/58ks7ukm؛ أحمد سلوم، "خريطة انتشار الميليشيات الإيرانية في سوريا والعراق"، إيران وير، 8 أيار 2020. https://iranwire.com/ar/reports/84061/#google_vignette

## 2.3. Komên Xwecihî û Tevlihev

### Alayîya El-Baqirê

Ev koma çekdar di nîvê sala 2012an de hat damezrandin. Xalid El-Hesen û birayê wî yê piçûk, El-Hac Hemza (Hemze El-Hesen), roleke sereke di damezrandina vê komê de gerand. Desteka darayî û leşkerî ji hêla Îranê ve tê kirin.

Ji bilî hejmareke piçûk a Îranîyan û hejmareke kêm a çeteyên Iraqî yên ku karê desteka lojîstîk û prosesên rênîşandêrîyê dikin, piranîya endamên alayîyê Sûrîyayî ne. Piranîya wan ji êla Begarayê ya Sunî ne. Her wiha hin kesên Şîî jî hene.

Ev kom bi awayekî pratîkî tev li pevçûnên salên 2014-2016an ên li dij hêzên opozisyona Sûrîyayê li Helebê bû. Ji serê sala 2017an ve, vê alayîyê hêza xwe ya li Helebê û gundewarê wê yê başûrî û rojhilatî xurttir kir. Ev yek jî bi rêya çalakîyên olî û çandî bû yên ku komele û sazîyên Îranê bi rengekî rasterast pêk tînin. Her wiha bi rêya kirîna xanûber û malan li bajarê Helebê û gundewarê wê. Endamên vê koma çekdar mafên sivîlan li Helebê binpê kirin û ji firotina petrola qaçax, dewar û tekberên malan dewlemend bûn[90].

Alayîya El-Baqirê van tabûran li xwe digire: Tabûrên Desttêwerdana Lezgîn, Tabûra Hec Hemîd, Tabûra El-Eşrefîyayê, Tabûra El-Şerqê, Tabûra El-Şemalê, Tabûra Henderatê, Tabûra Dêra Zorê, Tabûra 313ê, Tabûra El-Mehdîyê, Tabûra El-Sifêrayê û Tabûra Tirkanê. Di sê mehên dawîn ên sala 2018an de, bi sedan endamên vê komê perwerdeya xwe li leşkergehên taybet ên pasdaran li Îranê[91] dît.

### Alayîya El-Îmam El-Huseyn

Ev koma çekdar sala 2012an ji hêla Emced El-Behadilî yê Iraqî yê ji Tevgera Sedrî ve hat damezrandin. Ev kes berî sala 2011an li Sûrîyayê dima û sala 2017an miriye. Paşê Es'ed El-Behadilî[92] serkêşîya hêzê kir. Ev alayî hêzeke çekdar a pirnetewe ye: Çekdarên wê ji Libnan, Efxanistan, Pakistan, Yemen, Sûdan û hin dewletên din in. Her wiha çekdarên Sûrîyayî jî di nav vê komê de cih digirin. Navenda alayîyê li devera El-Seyida Zeynebê ye. Ji wir, xebatên xwe yên leşkerî û şerên li dij hêzên opozisyona Sûrîyayî, di nav de operasyonên li Xûtaya Rojhilatî[93], dide destpêkirin.

90 خالد الخطيب، "حلب: كيف أصبح لواء الباقر حجر عثرة بوجه الروس؟"، المدن، 21 نيسان 2019 https://tinyurl.com/mrx76xzz

91 لحظة مقتل مقدم في ميليشيا لواء الباقر خلال سقوط قذيفة عليه بريف حلب (فيديو)"، أورينت.نت، 4 شباط 2020" https://tinyurl.com/424he3ut

92 أيمن جواد التميمي، "مقابلة مع قائد كتيبة الموت التابعة للواء الإمام الحسين"، 2 نيسان 2019 https://www.aymennjawad.org/22526/

93 عهد فاضل، "ميليشيات لواء الإمام الحسين في غوطة دمشق"، العربية.نت، 12 آذار 2018 https://tinyurl.com/2y38jw62

Ev alayî ji çend beşan pêk tê ku di nav de hêzên taybet ên xwedî çekên pêşketî, beşa rêberîyê û beşên lojîstîk hene. Îranê, bi rêya firoke û keştîyên kargoyê, cebilxaneyeke pir mezin gihand vê hêzê. Kovara Newsweekê[94] ev koma leşkerî wekî "koma herî hêzdar a Îranê li Sûrîyayê" bi nav kir. Kovarê dîyar kir ku ev kom dikare êrîşan bibe ser hêzên DYA û Îsraîlê. Endamên vê koma çekdar ji hêla Parartêşa Qudsê û hêzên taybet ên Hizbullaha Libnanî ve tên perwerdekirin. Made û lojîstîka alayîyê ji hêla Parartêşa Çarem a Artêşa Sûrîyayê ve tên dabînkirin.

### Alayîya Se'dayê ya Yemenî

Sala 2003yan bi destek û sponsorîya Îranê hat damezrandin. Çekdarên wê ji Tevgera Hûsî ya Yemenê ne. Bi rêya vîzayan digihêjin Bexda yan Beyrûtê û paşê li leşkergehên taybet tên perwerdekirin û ji bo şerkirinê[95] bo Şamê tên veguhastin. Di nav wan de hin endam hene ku di nava Artêşa Yemenê de şer kirine û bûne pisporên şer. Hejmara endamên vê komê gihaşt 750 çekdarî. Bi dehan çekdarên vê komê li deverên Milêha û Coberê yên gundewarê Şamê û Busra û Izer'ê yên Der'ayê hatin kuştin. Piranîya wan, ji bo şer, vegerîyan bakurê Yemenê û tenê nêzî 100 çekdarî man û tev li Alayîya Ebû El-Fedil El-'Ebas bûn[96].

## 2.4. Çeteyên Efxan û Pakistanî

### Parartêşa Fatimîyûnê ya Efxanî



Ev parartêş, dema Şerê Îran û Iraqê yê salên heştêyî, di nav hêzên Pasdarên Îranê de hat damezrandin. Wê demê, Îranê keysa xwe li hebûna gelek penaberên Efxan li Îranê anî û bi sedan welatîyên Efxanistanê kirin leşkerên xwe[97]. Wî çaxî, wekî Alayîya Ebî Zir dihat naskirin[98]-[99]. Di Gulana 2013an de, gava desttêwerdana Îranê di şerê Sûrîyayê de zêde bû, serkêşê wê demê yê Parartêşa Qudsê, Qasim Suleymanî, avakirina milîsên Alayîya Fatimîyûnê ragihand ku çekdarên ji penaberên Efxan ên li Iraq û Sûrîyayê diman, Efxanên ji Efxanistanê bi xwe û hin çekdarên ji dewletên Ewropayê[100] di nav xwe de dihewandin. Alayîyê, Efxanên ku temenê wan ji 18

94 Tim O'Connor, "Iran's Most Powerful Unit Yet in Syria Targets U.S. and Israel, Intel Finds", Newsweek, 21 Jul 2023, https://www.newsweek.com/irans-most-powerful-unit-yet-syria-targets-us-israel-intel-finds-1814151

95 مصدر رسمي يمني للقدس العربي: حوثيون يقاتلون مع النظام السوري"، القدس العربي، 17 تشرين الثاني 2013"، https://tinyurl.com/52m23sa3

96 محمد السلمي، "إيران وعسكرة التشيع في الداخل والخارج"، مجلة السياسة والاقتصاد، جامعة بني سويف، تموز 2021 https://jocu.journals.ekb.eg/article_181405.html

97 Lars Hauch, "Understanding the Fatemiyoun Division: Life Through the Eyes of a Militia Member", Middle East Institute, 22 May 2019, https://www.mei.edu/publications/understanding-fatemiyoun-division-life-through-eyes-militia-member

98 Heman çavkanîya borî.

99 Ahmad Majidyar, "After ISIS, Fatemiyoun Vows to Fight with "Axis of Resistance" to Destroy Israel", 22 Nov 2017, https://www.mei.edu/publications/after-isis-fatemiyoun-vows-fight-axis-resistance-destroy-israel

100 شادي عبد الوهاب منصور، حروب الجيل الخامس: أساليب "التفجير من الداخل" على الساحة الدولية، العربي للنشر والتوزيع، 2019.

salan kêmtir e[101] -bi şertê ku destûreke nivîskî ya dê û bavên wan hebe- dikirin leşkerên xwe. Prosesên leşkerkirinê herî zêde di nav Efxanên Şiî yên Hezare yên li Îran û Efxanistanê de berbelav in. Nêzî meheké tên perwerdekirin û paşê bo xetên pêşîn ên şerê li Sûrîyayê tên şandin[102]. Ji bilî xwexilaskirina ji barê penaberên Efxan ên li ser axa xwe, Îran sûdê ji leşkerkirina Efxanan li Sûrîyayê dibîne da ku -piştî vekişandina hêzên DYAyê ji Efxanistanê- asta wan a leşkerî bilind bike û di siberojê de wan li dij Talebanê û komên din ên li Efxanistanê bi kar bîne[103].

Partartêşa Qudsê vê koma çekdar bi pere û çek dike û rênîşandêrîya wê dike. Mûçeyeke mehane ya ji 500 heta 1500 $ dide her endamekî. Jixwe ev mûçeya herî giran a milîsên Îranê ye ku endamên milîsên din mûçeyeke mehane ya ji 300 heta 700 $ digirin[104]-[105]-[106].

Sala 2015an, pileya koma Fatimîyûnê bo parartêşê berz bû û li devera Helebê ya li bakur û bakurrojhilatê Sûrîyayê bi cih bû: Li gundewarê başûrî, li derdora Çiyayê 'Ezanê (nêzî baregeha leşkerî ya Pasdarên Îranî û li devera kolejên leşkerî ya rojavayê bajêr), li bakurê Bajarê Pîşesazîyê yê li devera Şêx Neccarê û devera Mezari'ê ya ku Zindana Navendî û Leşkergeha Feysel Qasimê ji hêla bakur ve ji hev vediqetîne. Wekî din, piştî sala 2019an, gava hêzên opozisyonê ji bakurê Hemayê vekişîyan, Parartêşa Fatimîyûnê serdestîya xwe berfirehtir kir û êdî endamên wê li gelek xalên li ser her du alîyên Rêya M4ê cih girt. Wekî din, çekdarên wê li gelek xalên biyabana Sûrîyayê, başûrê Ferata Navîn, li Tedmurê û çend xalên li ser her du alîyên rêya Dêra Zorê û Himsê heta bi bajarê Sixnayê û bajarê Bûkemalê yê li ser sînorê Iraq û Sûrîyayê hene. Li van deveran, gelek endamên vê koma çekdar li gel malbatên xwe bi cih bûne.

Bajarê Meyadînê bi temamî li jêr kontrola Parartêşa Fatimîyûnê ye. Tew navên taxên bajêr guhartine û alayên partîyên ÎRanê, alayên olî û wêneyên serkêşên Îran û pasdaran li kolanên bajêr belav kirine[107]. Vê komê ciwanên Sûrîyayê jî di nav refên çekdarên xwe de bi çek kirine: Tenê di çar mehên pêşîn ên sala 2021ê de, karîbû 710 kesan li Qamişlo û Hesekê bixe nav refên çekdarên xwe; 315 kes endam û serkêşên Dîfa' El-Wetenî (Berevanîya Niştimanî) bûn û 395 jî kesên sivîl û endamên êlan bûn. Her wiha bi dehan xanûber li deverên jêr kontrola hêzên Hikûmeta Sûrîyayê li bajarê Hesekê kirîn[108]. Her wiha girtîgeheke xwe ya taybet li bajarokê El-Tibnîyê yê rojavayê Dêra Zorê ava kir[109]. Wekî din, parartêşê Yekîtîya Cotkaran li deverên Meyadînê yên li jêr kontrola xwe ji holê rakir û desteyeke xwe ya çandinîyê ya taybet li şûnê

101 Saeed Kamali Dehghan, "Afghan refugees in Iran being sent to fight and die for Assad in Syria", The Guardian, 5 Nov 2015, https://www.theguardian.com/world/2015/nov/05/iran-recruits-afghan-refugees-fight-save-syrias-bashar-al-assad

102 Naomi Conrad, "Iran recruits Afghan teenagers to fight in Syria", Deutsche Welle, 5 May 2018, https://www.dw.com/en/iran-recruits-afghan-teenagers-to-fight-war-in-syria/a-43634279

103 Sune Engel Rasmussen, Zahra Nader , "Iran covertly recruits Afghan Shias to fight in Syria", The Guardian, 30 Jun 2016, https://www.theguardian.com/world/2016/jun/30/iran-covertly-recruits-afghan-soldiers-to-fight-in-syria

104 حاتم الفلاحي، "الميليشيات العراقية في سوريا: الدور والمستقبل"، الجزيرة.نت، 1 نيسان 2019، https://studies.aljazeera.net/ar/reports/2019/04/190401092356143.html

105 Eli Lake, "Iran Spends Billions to Prop Up Assad," Bloomberg, 9 Jun 2015, https://www.bloomberg.com/opinion/articles/2015-06-09/iran-spends-billions-to-prop-up-assad ; Babak Dehghanpisheh, "The Iraqi militia helping Iran carve a road to Damascus", Reuters, 22 Sep 2017, https://www.reuters.com/investigates/special-report/mideast-crisis-iraq-nujaba/

106 مهند الحاج علي، "معركة السيدة زينب، بوابة الجحيم الطائفي"، لبنان الآن، 8 نيسان 2013، http://goo. gl/rtS8XO

107 مركز الدراسات الإيرانية (إرام) غير الحكومي، لواء فاطميون: فيالق إيران الأفغانية

108 "بالأرقام: التوسع الإيراني في سوريا عام 2021"، النهار العربي، 29 كانون الأول 2021، https://www.annaharar.com/arabic/news/arab-world/syria/29122021092902208

109 "بعد ازدياد الانتهاكات بحق المدنيين السوريين: فاطميون تنشئ معتقلاً جديداً في التبني"، عين الفرات، 24 آذار 2021، https://eyeofeuphrates.com/ar/news/2021/03/24/1487

xebitand. Ev deste, alavên cotkirin û çinînê bi nirxekî ji bazarê erzantir dabîn dike û destekê dide hemû qonaxên çandinîyê, lê bi şertê ku ew tenê berhemên çandinîyê bikire[110].

Di milê binpêkirinan de, endamên vê komê mafên welatîyên Sûrîyayê yên sivîl li deverên mîna Qelemûn û Zebedanîyê yên gundewarê Şamê binpê kirin. Endamên wê beşdarî dorpêçkirina Medayayê jî bûn; xelkên wê birçî kirin û gelek ji wan sivîlan ji birçînan mirin. Ev koma çekdar beşdarî şerên kontrolkirina Xûtaya Rojhilatî, şerê derdora Firokexaneya Şamê ya Navdewletî û gundewarê başûrê Şamê heta bi parêzgeha Der'ayê bû û şerê xwe gihand Hims, Tedmur, El-Qisêr, Zevîya El-Şa're ya Petrolê û bi xurtî beşdarî pevçûnên ji bo şikandina dorpêça li ser Zindana Helebê bû[111].

## Alayîya Zeynebîyûnê ya Pakistanî

Ji nav hemû milîsên çete yên ku li Sûrîyayê çalak in, navdarîya Alayîya Zeynebîyûnê pir kêm e û ragihandinê jî kêm behsa wê kiriye. Hem ji ber ku hejmara çekdarên wê kêm e hem jî ji ber ku beşdarîya wê ya di şer de pir sînordar e. Her wiha ji ber ku çekdarên wê bi dizî kar dikin; çimkî ji alîyekê ve ji Tevgera Talebanê yan Saloxgerîya Pakistanê ditirsin û ji alîyekî din ve ji ber bêbandorîya çekdarên wê di şerên têkşikandina dorpêça li ser bajarokên Nubul û Zehrayê yên bakurê Helebê de, îcar wer xuya ye ku Îranê xwestiye çekdarên wê di tecribeyên şer re derbas bike da ku bikare wan di şerên herêmî yên siberojê de bi kar bîne, nemaze li navend û rojavayê Asyayê[112].

Ji salên pêşîn ên Şoreşa Îslamî ya Îranê ve, Tehranê bala xwe da Şîîyên Pakistanê. Îranê, bi rêya vekirina navendên çandî li bajarên sereke yên Pakistanê, derîyek di dîwarê civaka Pakistanê de vekir. Wê 300 amojgehên dînî yên Şîî û 50 zanîngehên mezhebî vekirin da ku xwendekarên Şîî ber bi xwe ve bikişîne. Jixwe wê salane bi hezarên xwendekaran dikirin welatîyên xwe û welatîname didan wan. Her wiha, di vî warî de, Îranê projeyên mezin li Lahor û Keraçîyê û deverên din ên Şîîyan vekirin û destek da tevgera sepandina feqîtîya Ce'ferî ya tundra û milîsên Artêşa Muhemed a ku bi pêkanîna reşkujîyan û gelek êrîşên tundra yên mezhebî yên destpêka salên nodî yên sedsala borî tê tawanbarkirin. Wekî din, Îranê leşkergeh ji bo perwerdekirina ciwanên Şîî li devera Paraçinarê ya êlparêz a li ser sînorê Efxanistanê vekir ku perwerdekirina wê bi serperiştîya komeke endamên Hizbullaha Libnanî pêk tê. Vê dawîyê jî, Îranê navendên leşkerkirinê vekirin da ku ev endamên nû li Iraqê, di nav refên milîsên 'Esaib Ehil El-Heq û Ebû El-Fedil El-'Ebas de, şer bikin.

Pasdarên Îranê navendeke leşkerkirin û perwerdekirinê li bajarê Meşhedê yê Îranê vekir da ku çekdarên ji Pakistanê ber bi xwe ve bîne û wan wekî hêzeke êrîşker a taybet a bi navê "Zeynebîyûn"ê ya ku sala 2013an hat damezrandin, perwerde bike. Koma wan a pêşîn ji Zanîngeha El-Mustefayê ya Navdewletî bû. Ev zanîngeh, sazîyeke dînî ya bajarê Qumê ye,

110 "ميليشيا إيران تواصل جرائمها: تقارير ومصادر تكشف عن انتهاكات حزب الله في المدن السورية"، العرب مباشر، 10 كانون الأول 2021، https://arabmubasher.com/irans-militias-continue-their-crimesreports-and-sources-reveal-hezbollahs-violations-in-syrian-cities

111 "على رأسها لواء فاطميون الأفغاني وحزب الله اللبناني: الميليشيات التابعة لإيران في سورية"، المرصد السوري لحقوق الإنسان، 10 كانون الأول 2021، https://tinyurl.com/yr8r5ksy

112 "زينبيّون" و"فاطميوّن" على لائحة العقوبات الأمريكية: ما المعلومات المُتداوَلة عنهم؟" رصيف 22، 25 كانون الثاني 2019، https://tinyurl.com/5n7rsxt8

şaxên wê yên leşkerkirinê li Îslamabad û Beyrûtê hene û Koleja Îslamî ya Londonê, Koleja Endonezyayê ya Îslamî û Zanîngeha Zanistên Îslamî ya Ganayê girêdayî wê ne[113].

Vê dawîyê, Îranê dest ji leşkerkirina çekdarên ji nava Pakistanê berda, ew jî piştî ku Dadgeha Pakistanê ya Têkoşîna li dij Terorê serekên xwecihî yên Partîya Gel a Pakistanî -partîya Zulfîqar Elî Boto û keça wî- ya nêzî Îranê -a ku xwedêgiravî çepê naverast e- bi leşkerkirina ciwanên Şîî û şandina wan bo Sûrîyayê tawanbar kir[114]. Di encamê de, Îranê berê xwe da leşkerkirina karkerên Şîî yên Pakistanî yên li Mîrîtîyên Erebî yên Yekbûyî dijîn, ên ku hinek ji wan di encama şoreşên Bihara Erebî de hatibûn dersînorkirin[115]-[116]-[117].

## Duyem: Kompanîyên Ewlekarî û Kompanîyên Leşkerî yên Taybet

## 3. Çarçoveyeke Têgihî û Qanûnî ya Giştî

Kompanîyên leşkerî û yên ewlekarî yên taybet, sazîyên bazirganî yên taybet in û xizmetên leşkerî yan ewlehî yên bipere pêşkêş dikin. Xizmetên wan bi giranî, peydakirina pasevanên çekdar, parastina kesayet, kom, avahî û cihên din, sexbêrîkirin û xebitandina pergalên çekan, çavdêrîkirina girtîgehan û pêşkêşkirina rawêjkarî û perwerdekirinê bo hêzên xwecihî û endamên hêzên ewlekarîyê ye[118]. Îro, navendên lêkolînê yên DYAyê[119] du têrmên sereke di vî warî de raber dikin:

* (Private Security Contractor): Wate kompanîyên ku tev li operasyonên êrîşkar nabin û karê wan di çarçoveya pêşkêşkirina xizmetên parastin û pasevanîyê yên curbicur de dimîne.
* (Private Military Security Contractor): Ango kompanîyên leşkerî û ewlekarî yên taybet ên ku piştevanîya xebitîner a çekdar li deverên şer pêşkêş dikin.

113 “Iran’s Networks of Influence in the Middle East”, The International Institute for Strategic Studies, Nov 2019, https://www.iiss.org/en/publications/strategic-dossiers/iran-dossier/

114 وفاء زيدان، "اتهام حزب الشعب الباكستاني بدعم مجموعات تجند مقاتلين شيعة لسوريا"، عربي 21، 28 آب 2015، https://tinyurl.com/562rc565; Zubair Azam, Khuram Iqbal, “Shiite Mobilization and the Transformation of Sectarian Militancy in Pakistan”, Middle East Institute, 29 Mar 2017, https://www.mei.edu/publications/shiite-mobilization-and-transformation-sectarian-militancy-pakistan

115 "إيران والسياسة الخارجية: خيانة الداخل"، مركز المسبار للدراسات والبحوث، 23 تشرين الأول 2018، https://tinyurl.com/mryef9j9

116 Farzin Nadimi, “Iran’s Afghan and Pakistani Proxies: In Syria and Beyond?”, The Washington Institute for Near East Policy, 22 Aug 2016, https://www.washingtoninstitute.org/policy-analysis/irans-afghan-and-pakistani-proxies-syria-and-beyond

117 علي آلفونه، "استخدام سوريا كساحة تدريب: لواء زينبيون الباكستاني نموذجاً"، معهد دول الخليج العربية في واشنطن، 17 تموز 2018، https://agsiw.org/ar/using-syria-as-a-training-ground-the-case-of-the-pakistani-zeinabiyoun-brigade-arabic/

118 محمد صعايده، "دور الشركات العسكرية والأمنية الخاصة كفاعل دولي غير حكومي في العلاقات الدولية"، مجلة جامعة الاستقلال للأبحاث، 1 حزيران 2022، https://journal.pass.ps/index.php/aurj/article/view/277

119 عبد الناصر العايد، رشيد حوراني، "الشركات الأمنية والعسكرية تتنامى بصمت في الشرق الأوسط"، جسر برس، 19 نيسان 2020، https://tinyurl.com/87fbuj2a

Li gel ku cudakirina kompanîyên ewlekarî ji yên leşkerî pir zehmet e û karê wan heta radeyekê têkilî hev dibe, em dikarin bibêjin ku kompanîyên ewlekarî xizmetên xwe yên parastinê di dema şer û aştîyê de pêşkêşî kes û koman dikin û her çendî hin caran xizmetên êrîşbirinê raber dikin, lê xizmetên wan bi giştî yên berevanîyê ne. Li hêla din, kompanîyên leşkerî xizmetên xwe bi rengekî sereke pêşkêşî hikûmetên rewa û desthilatdarîyên de fakto dikin, karê wan li deverên nakok û şer in û operasyonên şer ên êrîşbirinê dibin serî. Ev kompanî di warekî din de jî dabeş dibin: Kompanîyên xwecihî yên ku di çarçoveya niştimanî de kar dikin û dikevin jêr desthilata qanûnên derbasdar ên dewleta ku lê kar dikin û kompanîyên sînorderbas. Ji salên nodî yên sedsala borî ve, gava şêwazên şeran hatin guhartin[120], ev kompanîyên sînorderbas derketin holê û êdî hin karên artêşan ên mîna destedan û perwerdekirinê bûn para kompanîyên taybet[121].

Di hilsengandina van kompanîyan de nêrînên cuda hene: Hin wan wekî desteyên leşkerkirina çeteyan dibînin û dibêjin ku dewlet wan bi kar tînin da ku xebatkarên xwe bêguneh bikin û binpêkirinên wan[122] paşperde bikin, peywira ewlekarî ya giştî bikin peywireke taybet û berevajî benda "03"em a Danezana Cîhanî ya Mafên Mirovan, parastineke taybet raberî kesên xwedî şiyan û hêz dikin. Hinên din dibêjin ku ew kompanîyên tomarkirî yên li gor qanûnê ne, nabe endamên wan wekî çete bên binavkirin û gerek e danûstandina li gel karmendên wan kompanîyan li gor rewş û karê her karmendî be. Zêdebarî vê yekê, alîgirên van kompanîyan dibêjin ku -berevajî çeteyên ku guh nadin qanûnê û derdê wan bi tenê qezenckirina pereyan e-, kompanîyên taybet bi hikûmetên rewa re kar dikin, karê xwe li gor pîvanên navdewletî yên şer dibin serî û di prosesên desttêwerdana mirovî ya li gor qanûna navdewletî de hikûmet alîkarîya van kompanîyan dixwazin, çimkî di vî milî de hikûmet berpirsên desttêwerdanê ne lê ne pabend in ku vê yekê bi xwe bikin. Li ser vî esasî, dewletên rojavayî ev behane derxistin pêş û li şûna artêşên xwe, kompanî bo aştîparêzîya li Somalyayê dan xebitandin. Heta bi Neteweyên Yekbûyî jî helwesta xwe ya li hember van kompanîyan nerm kir û êdî alîkarîyên wan ji bo dabînkirina desteka lojîstîk, rakirina mayînan û perwerdekirina tîmên ewlekarîyê dixwaze[123]. NYyê rênîşandêrîyên xwe yên der barê bikaranîna kompanîyên ewlekarî yên taybet de bo desteyên xwe hinartin û du mercên sereke danîn: 1. Divê kar bi rêya hikûmeta dewleta ku xebat lê tê kirin, bê meşandin. 2. Divê ew hikûmet, li gor peymaneke destnîşankirî, karê kompanîyê erê bike[124].

## 3.1. Danasîna Kompanîyên Ewlekarî û yên Leşkerî

Ji ber ku ev kompanî -li ser asta navdewletî- nû derketin holê, qanûnzanîyê nikarîbû danasîneke gelemper a yeker bo kompanîyên ewlekarî û yên leşkerî û endamên wan deyine. Ragihînerê taybet ê kolîna li meseleya bikaranîna çeteyan, bi rêya rapora xwe ya 13ê Kanûna Paşîn a sala 1999an a ji bo Encumena Aborî û Civakî dîyar kiriye ku ev kompanî hemû awayên alîkarî û perwerdekirinê di milên ewlekarîyê û xizmetên rawêjkarîyê de pêşkêş dike, ango desteka lojîstîk a neleşkerî raber dike. Rapor her wiha eşekre dike ku ev alîkarî, pasevanên ewlekarîyê

120 حسن الحاج احمد علي، "خصخصة الأمن: الدور المتنامي للشركات العسكرية والأمنية الخاصة"، مركز الإمارات للدراسات والبحوث الاستراتيجية، العدد 321، 2002.

121 Bjorn Moller, "Privatization of Warrant: the Regulation of Violence", Institute for History, International Studies.

122 مصطفى أحمد أبو الخير، الشركات العسكرية الأمنية الدولية الخاصة، دراسة قانونية سياسية، إيتراك للطباعة والنشر والتوزيع، 2008.

123 Patrick M. Regan, "Third Party Intervention and the Duration of Intrastate Conflicts", The American Political Science Association, 28 August - 1 September 2000.

124 David Beal, "The Price of Peace: The Political Economy of Peace Operations", The North-South Institute and The Pearson Canadian International Peacekeeping Centre, 30 Nov - 1 Dec 2001.

yên çekdar, apsevanên ku di çalakîyên leşkerî yên parastin û êşîkirinê de kar dikin û çalakîyên girêdayî ewlehîya di şer û piştî şer de di nav xwe de dihewînin.

Benda 2yem a projeya lihevkirina navdewletî ya der barê kompanîyên leşkerî û yên ewlekarî yên taybet[125] de ew wiha dane nasîn: "Dezgeheke qanûnî ye ku li gor qanûnên dewleteke endam tê damezrandin. Li beranber bedelekî darayî, xizmetên leşkerî û/yan ewlehî bi rêya kes an sazîyên qanûnî pêşkêş dike. Ev yek jî li gor rêpêdaneke taybet diçe serî."

## 3.2. Birêxistina Qanûnî ya Kompanîyên Ewlekarî û Kompanîyên Leşkerî yên Taybet

Du hewldan hebûn ku dixwestin kompanîyên leşkerî û ewlekarî yên taybet bikevin jêr sîya qanûna navdewletî ya mirovî, lê belê her du hewldanan nekarî bikevin çarçoveya neçarkirinê. Her du hewldan ev in:

1. "Rêziknameya Reftarên Yekîtîya Prosesên Aştîyê yên Navdewletî" ya kompanîyên ku di pêvajoya şerên çekdar ên di nav prosesên aştîyê yên anvdewletî yên Kanûna Paşîn a sala 2006an de kar dikin. Ev rêzikname bo teqezkirina pabendbûna bi pîvanên sincî, qanûna navdewletî ya mirovî û qanûna mafên mirovan bû.

2. "Belgeya Montroyê ya sala 2008an", a pabendbûnên navdewletî û reftarên saxlem ên prosesên kompanîyên leşkerî û ewlekarî yên taybet di dema şeran de.

### Berpirsyarîya Sizayî û Tawankarî ya Kompanîyên Ewlekarî-Leşkerî yên Taybet

Der barê berpirsyarîya sizayî û tawankarî ya endamên kompanîyên ewlekarî-leşkerî yên taybet de, sivîl an çekdar bin, divê di karên xwe de rêzê li qanûna niştimanî ya dewleta ku lê kar dikin bigirin, her wiha rêza qanûna navdewletî ya mirovî jî bigirin, çimkî ev qanûn di milê şeran de gelempertir e. Wekî din, eger karekî derqanûnî bi tena serê xwe bikin an jî li gor fermana serekên xwe bikin; berpirsyarîya wan a sizayî û tawankarî ya kesane heye.

Li hêla din, berpirsyarîya sizayî û tawankarî ya dewletên ku ev kompanî xizmeta wan dikin jî heye. Dewleta peymandar a ku van kompanîyan bi kar tîne, berpirsyara sizayî û medenî ya qerebûkirina ji ber pabendnebûna endamên van kompanîyan bi rêzikên qanûna navdewletî ya mirovî ye. Benda yekem a lihevkirinên Cenevê, dewletan neçarî rêzgirtina li qanûna navdewletî ya mirovî dike û dibêje ku gerek e gavên pêwîst ên pêkanîna vê armancê bên avêtin û dewlet sazgêrîyên çavdêrîkirinê yên ji bo misogerkirina rêzgirtina li van rêzikan deyine. Li ser vî esasî, gerek e dewletên ku van kompanîyan kirê dikin, çavdêrîya karê wan bikin û wan neçarî rêzgirtin û xweperwerdekirina berdewam a li ser rêzikên qanûna navdewletî ya mirovî bikin.

Çima dewlet berpirsyara karên van kompanîyên ewlekarî-leşkerî yên taybet e? Ji ber ku dewlet beşeke peywirên xwe yên hikûmetî dispêre kompanîyeke taybet û êdî ev dewlet berpirsyara binpêkirinên qanûna navdewletî ya mirovî yên ku kompanî dike madem dewletê

125 Draft for international convention on private military and security companies 2008 experts for regional consultation. Eastern region group and central Asian region.

erkên xwe yên di nava şer de spartiye kompanîyê. Li gor benda 5em a projeya komîteya qanûna navdewletî ya li barê berpirsyarîya dewletan a ji ber karên ku li ser asta navdewletî[126] ne rewa ne: "Li gor qanûna navdewletî, her reftara kesekî yan sazîyeke ku li gor benda çarem ne dezgeheke dewletê ne lê bi rêdana qanûna wê dewletê karekî desthilata hikûmetî dikin, wekî reftara dewletê bi xwe tê pejirandin. Lê bi her halî bi şertê ku wî kesî yan kompanîyê ew reftar li jêr navê wê peywirê pêk anîbe."

Ev deqa qanûnî ya ku berpirsyarîya endamên kompanîyan dispêre dewletê, tenê di têkilîya van kesan de bi dewleta peymandar re sûddar e, çimkî divê -li gor qanûnê- spratedarîyeke erkan a ji hêla dewletê ve hebe. Lê li barê têkilî û berpirsyarîya dewleta ku ev kes li ser erda wê kar dikin an dewleta ku destûr daye wê kompanîyê; berpirsyarîya dewletê ji ber karên peymandaran li gor deqa benda 8em a projeya komîteya qanûna navdewletî ya li barê berpirsyarîya dewletan ji karên nerewa yên li ser asta navdewletî tê hilsengandin. Ew bend daxwaza pêwendîyeke rastîn a di çarçoveya serperiştî yan çavdêrî yan rênîşandêrîyê de, di têkilîya  navbera peymandar û dewletê de, dike. Ev bend dibêje: "Li gor qanûna navdewletî, her reftara kesekî yan çend kesan ku di rastîyê de li gor fermanên dewletê yan rênîşandêrîya wê, yan jî di dema pêkanîna wî karî de li jêr çavdêrîya wê hatiye kirin, wekî reftara dewletê bi xwe tê pejirandin."

Wekî din, li barê berpirsyarîya sizayî û tawankarî ya dewleta ku kompanîyê welatînameya wê hilgirtiye yan li ser erda wê hatiye damezrandin an li ser erda wê kar dike, ji bo ku çavdêrîkirina li kompanîyan li derveyî cih û warê wan ê resen pêk were, divê dewlet hin pêngavên qanûnî yên pêkanîna çavdêrîkirinê biavêje. Mînaka vê jî Afrîkaya Başûrî ye ya ku qanûnek danî ku karê derveyî yê kompanîyên ku welatînameya Afrîkaya Başûrî hildigirin bi rê dixe û saz dike da ku dewlet rêzgirtina li rêzikên qanûna navdewletî ya mirovî misoger bike. Her wiha divê dewleta ku ev kompanî li ser erda wê kar dikin an mêvandarîya wan dike, heta radeyekê çavdêrî û serperiştîyê bike. Wate, dewlet dikare mercan li pêş pêşwazîkirina van kompanîyan deyine, mînak: Dikare daxwaza perwerdekirina di warê qanûna dewletî ya mirovî de li wan bike, yan sizayên niştimanî yên hundirê welêt li wan ferz bike, yan wan neçar bike ku ji bo her peymanekê, li gor şêwaza çalakîyên pêşniyazkirî û rewşa welatê ku dê lê kar bikin, rêpêdanekê bi dest bixin û li vir dewlet dikare sizayên ji ber karê bêrêpêdan destnîşan bike[127].

Li gel ku qanûndanerê navdewletî karê kompanîyên ewlekarî û leşkerî bi rê xistiye, lê belê wî pergal an dariştineke destnîşankirî ya xebat û tomarkirina wan raber nekiriye. Vê yekê jî destnîşankirina berpirsyarîyan zehmettir kir û kêşeya darizandina ji ber binpêkirinên endamên kompanîyan derxist holê, çimkî ji hêla teorîk ve, qurbanî dikarin bi çend awayan kompanîyan ji ber binpêkirinan û karên wan ên li dij mafên mirovan û qanûna navdewletî ya mirovî bikişînin dadgehan. Her wiha dikarin ji ber tawanekê ji tawanên ku di pergala Romayê de ya ku Dadgeha Tawankarîyê ya Navdewletî damezirandiye bînin dadgehan, an jî ji ber karên ku dewleta ku qurbanî welatîyê wê ye, wan wekî tawan bi nav dike.

126 Projeya komîteya qanûna navdewletî ya li barê berpirsyarîya dewletan a ji ber karên ku li ser asta navdewletî ne rewa ne, bi biryara 589-56an a Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ya ku di 28ê Kanûna Paşîn a sala 2002yan de hatiye girtin - rapora Komîteya Qanûna Navdewletî ya li barê xebatên xula pêncî û duyem a komeleyê - Salnameya Komîteya Qanûna Navdewletî - Bergê Duyem - Beşa Duyem - rû: 53.

127 "2012 آب 15 ،اللجنة الدولية للصليب الأحمر ."القانون الدولي الإنساني والشركات العسكرية والأمنية الخاصة https://www.icrc.org/ar/doc/resources/documents/faq/pmsc-faq-150908.htm

Ev yek bi vî rengî diçe serî:

- * Eger ew dewleta ku kompanî lê kar dike, parêzbendîyeke ji darizandinê kiribe para kompanîyê, wê gavê, qurbanî dikare berê xwe bide dadgehên niştimanî yên dewleta ku kompanî lê hatiye damezrandin.
- * Dadgehên niştimanî ên dewletên ku endamên kompanîyan an peymandarên wan, welatîyên wê ne. Helbet piştî ku nasnameyên wan endaman bên destnîşankirin.
- * Li dadgehên xwedî desthilatîyeke navdewletî, ango dadgehên Ewropayî yên niştimanî yên ku desthilata wan a nêrîna li dozên der barê binpêkirinên mafên mirovan de heye, lê belê divê mercên formal ên darizandinê hebin.

Jixwe gava dozgerê giştî yê dadgehên sizayî/tawankarî yên navdewletî bawer bin ku gerek e doz bê destpêkirin; ev dadgeh dikarin li van tawanan binêrin. Lê belê rê û rêbazên borî yên darizandinê di çarçoveya teorîk de asê dimînin, çimkî rêya dadmendîya navdewletî bi hesabên siyasî û berjewendî û lihevkirinan astengkirî ye. Wekî din, şêwaza karê van kompanîyên ku wekî artêşên sîberê hatine binavkirin, naskirina navên tawankarên girêdayî wan û destnîşankirina nasnameyên wan zehmettir dike ku jixwe binavkirina tawankaran û destnîşankirina nasnameyên wan, bingehên dozlêvekirin û darizandinê ne.

# 4. Kompanîyên Ewlekarîyê-Leşkerî yên Rûsyayî

## 4.1. Çarçoveyeke Giştî ya Kompanîyên Ewlekarîyê-Leşkerî yên Rûsyayî

- Serê sala 2015an, hin raporên medyayî teqez kir ku Rûsyayê bi rêya çeteyên di nav kompanîyên leşkerî yên taybet de xwe bi kûrahî berdaye nav şerê Sûrîyayê û êdî van çeteyan li rex hêzên Hikûmeta Sûrîyayê dide xebitandin[128]. Di dawîya meha Çirîya Pêşîn a heman salê de, hat eşkerekirin ku ji 3[129] heta 9[130] peymandarên leşkerî yên Rûs ji encama êrîşekê bi topên hawanê ya çekdarên opozisyona Sûrîyayê li ser devereke Laziqîyayê hatin kuştin.

128 Maria Tsvetkova, "Dying for a paycheck: the Russian civilians fighting in Syria", Reuters, 21 Dec 2017, https://web.archive.org/web/20190424161115/https:/www.reuters.com/article/us-mideast-crisis-syria-russia-fighters/dying-for-a-paycheck-the-russian-civilians-fighting-in-syria-idUSKBN1EF0RI

129 Thomas Grove, "Up to Nine Russian Contractors Die in Syria, Experts Say", The Wall Street Journal, 18 Dec 2015, https://web.archive.org/web/20210225022216/https:/www.wsj.com/articles/up-to-nine-russian-contractors-die-in-syria-experts-say-1450467757

130 Mariam Karouny, "Three Russians killed in Syria: pro-government source", Reuters, 20 Oct 2015, https://web.archive.org/web/20200919175732/https:/www.reuters.com/article/us-mideast-crisis-syria-russia/three-russians-killed-in-syria-pro-government-source-idUSKCN0SE1YO20151020

* Li gor navgînên ragihandinê yên Rûsyayê, çekdarên Rûs berî desttêwerdana fermî ya Rûsyayê ya Çirîya Pêşîn a sala 2015an[131] a di şerê Sûrîyayê de tev li şerê li welêt bûne. Li gor berpirsekî Ajansa Bicihkirina Qanûnê ya Ukraynayê, 1700 çeteyên Rûs bo Sûrîyayê hatine hinartin; ji van hinekan berê li Ukraynayê[132] şer kiriye. Ev çete tev li operasyonên leşkerî bûne û serkêşî jî kirine, ji ber vê sedemê gelek kuştîyên wan çêbûne[133].
* Sala 1992yan, qanûna yekem a Rûsyayê ya der heqê damezrandin û karê kompanîyên ewlekarîyê yên taybet de hat danîn. Paşê, serokê berê yê Rûsyayê, Borîs Yeltsîn, peymanên parastina binesazîyê li gel kompanîyên "Gazprom" û "Transneft"ê îmze kirin. Di encamê de, ev kompanî bûn artêşên piçûk ên ku bi hezaran endamên wan hene û êdî karên wan ji peywirên ewlekarîyê gihan asta karê leşkerî[134].
* Piştî sala 2000î, ev kompanî bûn kevirê bingehîn ê siyaseta derveyî ya Rûsyayî û êdî hin kompanî rola artêşa alternatîv digerînin. Bi vî awayî, Rûsya, bêyî ku hêzên xwe yên fermî tev li şeran bike, bi rêya van kompanîyan beşdarî operasyonên leşkerî dibe û êdî neçar nabe ku behaneyan ji ber desttêwerdana xwe raber bike. Ev yek wekî "mandelkirina qebûlkirî/plausible deniability" tê binavkirin û gelek caran di operasyonên leşkerî yên Yekîtîya Soveytê de dubare bûye.
* Serokê Rûsyayê, Vladîmîr Pûtîn, dîyar kir ku bêyî ku beşdarîyeke rasterast a ji hêla dewletê ve hebe[135], ev kompanî wekî amyareke pêkanîna berjewendîyên niştimanî ne. Di sala 2015an de, Pûtîn biryarnameya 3yem[136] a li barê serrastkirina pergala hêzên çekdar ên dewletê deranî. Li gor vê biryarnameyê, êdî dewlet dikare peymanan li gel welatîyên biyanî yên li derveyî welêt deyine da ku peywirên şer pêk bînin û tev li şerên Artêşa Rûsyayê yên li hundir û derveyî Rûsyayê bibin. Lê belê divê kesên dixwazin peymanê li gel Artêşa Rûsyayê deynin, berê xwe bidin yekîneya leşkerî ya Rûsyayê ya li cihê niştecihbûna xwe û daxwaznameykê raber bikin[137].
* 23ê Çirîya Paşîn a 2017an, serekê Artêşa Rûsyayê, Valerî Gerasîmov, ragihand ku Moskova biniyaz e ku "dawîya salê, hevdemî kêmbûna asta şer, beşeke hêzên xwe yên li Sûrîyayê bikişîne da ku kompanîyên leşkerî yên taybet ên xwedî şiyanên taktîkî yên şer ên mîna artêşên hikûmetî şûnê bigirin."[138]

---

131 Vladimir Dergachev, Ekaterina Zgirovskaya, "Russian mercenaries in the battles for Palmyra", Gazeta.ru, 24 Mar 2016, (Russian) https://www.gazeta.ru/politics/2016/03/22_a_8137565.shtml

132 Maria Tsvetkova, Anton Zverev, "Ghost soldiers: the Russians secretly dying for the Kremlin in Syria", Reuters, 3 Nov 2016, https://web.archive.org/web/20190519042310/https://www.reuters.com/article/us-mideast-crisis-syria-russia-insight-idUSKBN12Y0M6

133 "Private Military Companies: History and Present Day", Militaryarms.ru, 13 Oct 2018, (Russian) http://militaryarms.ru/armiimira/chastnie-voennie-kompanii/

134 عبد الناصر العايد، رشيد حوراني، "الشركات الأمنية والعسكرية تتنامى بصمت في الشرق الأوسط"، جسر برس، 19 نيسان 2020، https://tinyurl.com/87fbuj2a

135 الشركات العسكرية الخاصة.. جيش موسكو الآخر في سوريا"، الخليج الجديد، 3 كانون الأول 2017"، https://thenewkhalij.news/article/88636

136 Jaroslaw Adamowski, "Russia Enables Foreigners To Serve In Armed Forces", Defense News, 7 Jan 2015, https://www.defensenews.com/global/europe/2015/01/07/russia-enables-foreigners-to-serve-in-armed-forces/

137 روسيا تسمح للمقاتلين الأجانب التعاقد مع جيشها"، العربي الجديد، 3 كانون الثاني 2015"، https://tinyurl.com/4uvsazs4

138 عبد الناصر العايد، رشيد حوراني، "الشركات الأمنية والعسكرية تتنامى بصمت في الشرق الأوسط"، جسر برس، 19 نيسان 2020، https://tinyurl.com/87fbuj2a

* Li gor lêkolîneke Sazîya Norweçî ya Lêkolînên Parastinê[139], serkeftina van kompanîyan a di warê berjewendîyên Rûsyayê de tundûtûjîyeke zêde û binpêkirinên mafên mirovan li gel xwe anîn; di nav de bikaranîna zêde ya hêzê, kuştina sivîlan, hingavtin û destdirêjî, îşkencekirin, armancgirtina dibistanan û talankirina berfireh. Ev hemû tawan û binpêkirin bi raporên navdewletî[140] yên ji Ukrayna, Malî[141] ya li Afrîkaya Navîn û Sûrîyayê hatine bibelgekirin. Li gor çekdarekî berê yê Wagnerê[142], "endamên Wangerê bi doqmaqekî giran li leşkerên Sûrîyayî yên ku ji şer direvîyan dida û serê wan jêdikirin û vîdeoyên van kiryaran digirtin da ku yên din bitirsînin."
* Kompanîyên leşkerî yên taybet ên Rûsyayê bi rengekî qanûnî nehatine tomarkirin û tu bacan jî nadin dewletê -wate tu hebûneke wan a fermî nîne[143]. Berevajî vê yekê, li gor benda 359an a Qanûna Sizayî û Tawankarî ya Rûsyayê ya sala 1996an, hebûna van kompanîyan bi xwe tawan e. Ev bend dibêje ku "leşkerkirina çeteyan an perwerdekirin û fînansekirina wan an dabînkirina her çavkanîyeke darayî bo wan, dibin sedema sizakirinê. Her wiha bikaranîna çeteyan di şerekî çekdar an êrîşan de dibe sedema zindankirina ji çar heta heşt salan."[144]
* Rewşa van kompanîyan li gel danasîna qanûnî ya kompanîyên leşkerî nagunce, ji ber ku ew -bi gelek rengan- girêdayî Hikûmeta Rûsyayê û armancên wê yên siyasî ne. Ew bi tu rengî ne sazîyên sermayedar in ên ku bi rêya xebitandin, leşkerkirin û veguhastina welatîyan -dûrî fermanên hikûmetê- ji bo qezenckirinê dixebitin.
* Endamên van kompanîyan ji efserên berê yên artêşê bi tenê pêk nayên, çimkî hin kompanî reklaman li ser rûpel û malperên înternetê diweşînin û dibêjin ku pêdivîya wan bi peymandaran heye. Li gor raporeke Rojnameya Daily Mailê ya Brîtanî[145], girtîyên tawankar ên di zindanên Rûsyayê de jî dibin endamên van kompanîyan[146]. Çeteyekî Rûs sedemên beşdarîya xwe û kesên din di şerê Sûrîyayê de wilo dîyar dike: "Hin kes hene ku hikmê zindankirinê li wan hatiye birîn, hinek li welêt bê kar û pere ne û hinên din berê endamên artêşê bûn û ji bo perwerdeya leşkerî hatibûn bajarê Rostovê yê Rûsyayê."

---

139 Åse Gilje Østensen, Tor Bukkvoll, "Russian Use of Private Military and Security Companies: The Implications for European and Norwegian Security", Norwegian Defence Research Establishment (FFI), FFI-RAPPORT 18/01300, 11 Sept 2018, https://www.ffi.no/no/Rapporter/18-01300.pdf

140 "2022 Country Reports on Human Rights Practices", US Department of State, 20 Mar 2023, https://www.state.gov/reports/2022-country-reports-on-human-rights-practices/

141 Nick Turse, "Wagner Group Disappeared and Executed Civilian in Mali", The Intercept, 24 Jul 2023, https://theintercept.com/2023/07/24/wagner-group-mali/

142 Eleanor Beardsley, "An ex-member of one of the world's most dangerous mercenary groups has gone public", NPR, 6 Jun 2022, https://www.npr.org/2022/06/06/1102603897/wagner-group-mercenary-russia-ukraine-war

143 Alexander Khramchikhin, "PMCs: Mercenaries or Agents of the Kremlin's Will?", Nezavisimoe Voennoe Obozrenie, 20 Apr 2018, https://nvo.ng.ru/realty/2018-04-20/1_993_chvk.Html ; Kimberly Marten, "Russia's use of semi-state security forces: the case of the Wagner Group", Post-Soviet Affairs, Volume 35, 2019 - Issue 3, https://www.tandfonline.com/doi/full/10.1080/1060586X.2019.1591142

144 The Criminal Code of The Russian Federation, No. 63-Fz, June 13, 1996.

145 Will Stewart, "Russian mercenaries secretly helping Assad in Syria are buying virgin 'wives' for £75 and beheading prisoners... just like the jihadists they're fighting, ex-soldier reveals", Daily Mail, 12 Oct 2017, https://www.dailymail.co.uk/news/article-4973598/Russian-mercenaries-buying-virgin-wives-75-Syria.html

146 Paul Goble, "Russian Nationalist Group, Acting as a Private Military Company, Worries Kremlin", 15 Nov 2018, https://jamestown.org/program/russian-nationalist-group-acting-as-a-private-military-company-worries-kremlin/

* Piştî sala 2018an, gava operasyonên leşkerî yên li ser erda Sûrîyayê kêm bûn, Kremlînê hin hêz û du baregehên sereke yên li Tertûs û Himêmîmê li Sûrîyayê hiştin[147]. Kompanîyên leşkerî jîrekîyeke rêxistinî ya bala nîşan da. Êdî li gel kêmbûna asta operasyonên leşkerî, vê jîrekîyê rê da kompanîyan ku endamên xwe ji nû ve bi cih bikin û berê çalakîyên xwe bidin parastina deverên giring û aborî û bi vî rengî karîbûn karê leşkerî û bazirganî bikin yek[148].

## 4.2. Kompanîyên leşkerî yên Rûsyayê li Sûrîyayê

### Koma Wangerê – Damezrandin û Berfirehbûn - Hesabgirtin

Raporên ragihandinê[149] dîyar dikin ku Wanger li Arjantînê an li Hongkongê tomarkirî ye, yan jî girêdayî Kompanîya LLC Concordê ya Xizmetên Birêvebirin û Şêwirmendîyê ye û xwedîyê wê karsazê Rûs Yevgenî Prîgojîn ê nêzî Kremlînê ye. Ji ber pabendîya wê ya bêsînor bi berjewendîyên Rûsyayê[150]-[151], ew bêhtir wekî alaveke jeopolîtîk a ji bo pêkanîna armancên Kremlînê tê dîtin. Herî zêde li deverên ku berjewendîyên stratejîk ên Rûsyayê dikevin jêr metirsîyê yan jî li deverên ku Rûsya dixwaze bandora xwe lê xurttir bike, endamên vê komê belav dibin.

#### Damezrandin û Berfirehbûn

Wanger, sala 2014an ji hêla Dmîtrî Utkîn ve hat damezrandin[152]. Utkîn endamekî berê yê Koma Moranê ya Ewlekarî bû û tev li refên Parartêşa Slavî li Sûrîyayê bû. Wangerê operasyonên xwe li Ukraynayê dan destpêkirin. Pêşî, komên şer ên çeteyan bûn û li jêr serperiştî û çavdêrîya hişk a Sloxgerîya Rûsyayê kar dikirin. Artêşa Rûsyayê ew perwerde kirin û çek dan wan[153]. Sala 2015an, Koma Wangerê mil da milê hêzên Hikûmeta Sûrîyayê û hêzên Îranê û şerê bejayî li Sûrîyayê kir[154]. Paşê çarçoveya karê wê berfirehtir bû û giha nêzî 13 dewletên Afrîkayê[155].

---

147 "Russian Mercenaries in Syria", Warsaw Institute, 22 Apr 2017, https://warsawinstitute.org/russian-mercenaries-in-syria/

148 "Private Military Companies: History and Present Day", Militaryarms.ru, 13 Oct 2018, (Russian) http://militaryarms.ru/armiimira/chastnie-voennie-kompanii/

149 "خططت لاغتيال الرئيس الأوكراني: ماذا تعرف عن "فاغنر" الروسية؟"، الجزيرة.نت، 2 آذار 2022، https://tinyurl.com/24935nh4

150 Andrew Higgins, Ivan Nechepurenko, "In Africa, Mystery Murders Put Spotlight on Kremlin's Reach", 7 Aug 2018, https://www.nytimes.com/2018/08/07/world/europe/central-african-republic-russia-murder-journalists-africa-mystery-murders-put-spotlight-on-kremlins-reach.html

151 سارة رينسفورد وكاثرين أرمسترونغ، "روسيا وأوكرانيا: بوتين يقول إن فاغنر ممولة بالكامل من موسكو"، بي بي سي عربي، 27 حزيران 2023، https://www.bbc.com/arabic/world-66035536

152 "The Last Battle of the "Slavonic Corps"", The Interpreter, 16 Nov 2013, https://www.interpretermag.com/the-last-battle-of-the-slavonic-corps/

153 "St. Petersburg Sends Contractors to Syria", The Interpreter, 15 Nov 2013, https://www.interpretermag.com/st-petersburg-sends-contractors-to-syria/

154 Heman çavkanîya borî.

155 خليل العناني، ""فاغنر": مرتزقة في خدمة إرهاب الدولة"، الجزيرة.نت، 27 حزيران 2023، https://tinyurl.com/333r7uzp

Hejmareke fermî ya çekdarên Wangerê nîne[156]. Li Sûrîyayê, li gor Rojnameya Republicê, li ser zarê çavkanîyeke ewlekarî ya Rûsî, "ji Adara 2016an ve nêzî 2500 çeteyên Wangerê li Sûrîyayê hene. Ji bo 1600 çeteyên Wangerê, budceyeke bi qasî 350 mîlyon dolarî hatiye terxankirin. % 40ê van çeteyan, ji ber kirina tawanên tirsnak, hatine binçavkirin." Lê piştî ku çekdarên Wangerê yên pispor ji Sûrîyayê hatin kişandin û bo Ukraynayê hatin şandin, hejmara çekdarên Wangerê bi giştî li Sûrîyayê kêm bû.

Bihara 2016an, gava hêzên Hikûmeta Sûrîyayê çekdarên DAIŞê ji bajarê Tedmurê qewirandin, roleke çekdarên Wangerê hebû û navê wan derket. Di vî şerî de, ji 2500 çekdarên Wangerê yên ku tev li vî şerî bûn, 32 çekdar hatin kuştin. Sala 2017an, çekdarên Wangerê, bo cara duyem, tev li şerê jinûvekontrolkirina bajarê Tedmurê bûn. Di vî şerê duyem de, çekên giran ên mîna tankên T-72yê û roketavêjên Gradê û topên Howitzerê yên 122 mm gihan destên Wagnerê[157]. Wagnerê ziyaneke canî ya zêde li Sûrîyayê danî, çimkî heta sala 2017an, 19 kuştîyên Artêşa Rûsyayê bi xwe hebûn lê belê 200 kuştîyên Wagnerê hebûn.

Hebûna Wagnerê li Sûrîyayê berteng bû[158] û êdî ji sala 2016an ve, piştî têkçûna têkilîya navbera Wagnerê û Wezareta Berevanîyê ya Rûsyayê ya ku desteka darayî û leşkerî dida vê komê, çavkanîyên Wagnerê ziwa bûn. Di encamê de, Yevgenî Prîgojîn kompanîyek bi navê "Evro Polis"ê damezrand. Vê kompanîyê, di Kanûna Pêşîn a heman salê de, peymanek li gel Sazîya Giştî ya Sûrîyayî ya Petrolê ya girêdayî Hikûmeta Sûrîyayê îmze kir. Li gor peymanê, Wagner dê zevî û binesazîyên petrolê yên li jêr serdestîya Rêxistina DAIŞê ya terorîst ji nû ve kontrol bike[159], wan zevîyan biparêze û li beranber vê yekê heta pênc salan % 25ê dahata petrolê wergire[160]. Lê belê kompanî dê mûçeyên mehane yên çeteyan ku ji 200 heta 300 hezar rublî ne, bide[161]-[162]. Adara 2021ê, Hikûmeta Sûrîyayê peymanek li gel Kompanîya Kapîtalê ya nasnekirî îmze kir û paşê eşkere bû ku ev kompanî girêdayî Koma Wagnerê ye. Li gor peymanê, kompanî dê di qasî 2250 km2 li beranber beravên başûrê Sûrîyayê li petrol û gazê bigere. Di dawîya sala 2019an de, kompanîyên Mercury û Filadayê[163] yên girêdayî Koma Wagnerê, peymanên petrol û gazê li gel Hikûmeta Sûrîyayê îmze kirin.

Di navbera 25 û 27ê Hezîrana 2023yan de, tam piştî ku serekkoma Wagnerê serî li dij Kremlînê hilda, li gor çavkanîyên ragihandinê[164], ji çekdarên Wagnerê hat xwestin ku li ser peymanên nû îmze bikin û êdî raporên xwe rasterast bigihînin Wezareta Berevanîyê ya Rûsyayê û mûçeyên wan jî hatin kêmkirin. Çekdarên ku ev merc nepejirandin, bi firokeyekê bo Malîyê hat veguhastin. Wezareta Berevanîyê ya Rûsyayê çekdarên Wagnerê ji zevîyên petrol û gazê

---

156 "Syria cracked down on Wagner after mutiny in Russia: Report", Aljazeera.com, 7 Jul 2023, https://www.aljazeera.com/news/2023/7/7/syria-cracked-down-on-wagner-after-mutiny-in-russia-report

157 Tor Bukkvolla, Åse G. Østensen, "Russian Use of Private Military and Security Companies: The implications for European and Norwegian Security", Norwegian Defence Research Establishment (FFI), 11 Sep 2018, https://www.cmi.no/publications/6637-russian-use-of-private-military-and-security

158 Nathaniel Reynolds, "Putin's Not-So-Secret Mercenaries: Patronage, Geopolitics, and the Wagner Group", Carnegie Endowment for International Peace, 8 July 2019, https://carnegieendowment.org/2019/07/08/putin-s-not-so-secret-mercenaries-patronage-geopolitics-and-wagner-group-pub-79442

159 Amy Mackinnon, "Putin's Shadow Warriors Stake Claim to Syria's Oil", Foreign Policy, 17 May 2021, https://foreignpolicy.com/2021/05/17/putin-shadow-warriors-stake-claim-syria-oil-energy-wagner-prigozhin-libya-middle-east/

160 Kevin Maurer, "Special Forces Soldiers Reveal First Details of Battle With Russian Mercenaries in Syria", 11 May 2023, https://thewarhorse.org/special-forces-soldiers-reveal-first-details-of-battle-with-russian-mercenaries-in-syria/

161 "مقاتلو "مجموعة فاغنر" في سوريا أداة موازية للجيش الروسي"، فرانس24، 21 آذار 2018، https://tinyurl.com/2h42w9sy

162 Kevin Maurer, "Special Forces Soldiers Reveal First Details of Battle With Russian Mercenaries in Syria", 11 May 2023, https://thewarhorse.org/special-forces-soldiers-reveal-first-details-of-battle-with-russian-mercenaries-in-syria/

163 Amy Mackinnon, "Putin's Shadow Warriors Stake Claim to Syria's Oil", Foreign Policy, 17 May 2021, https://foreignpolicy.com/2021/05/17/putin-shadow-warriors-stake-claim-syria-oil-energy-wagner-prigozhin-libya-middle-east/

164 Suleiman al-Khalidi, Maya Gebeily, "Syria brought Wagner fighters to heel as mutiny unfolded in Russia", Reuters, 7 Jul 2023, https://www.reuters.com/world/syria-brought-wagner-group-fighters-heel-mutiny-unfolded-russia-2023-07-07/

yên bajarê Tedmurê yê Sûrîyayê jî derxistin[165] û hevalbendên xwe yên bi navê "Nêçîrvanên Daişîyan"[166] xistin şûna wan. Wekî din, tê tercîhkirin ku Kremlînê dest danîbe ser saman û mewdanên komê û para wê ya di dahata zevîyên petrol û gazê de.

### Xebatên Hesabgirtina ji Wagnerê

Di 17ê Adara sala 2021ê de, li ser esasê parçevîdeoyeke ku ji sala 2017an ve li ser înternetê hatibû belavkirin, ku tê de gumanbaran vîdeoya xwe kişandibû gava welatîyekî sivîl ê Sûrîyayê -ê ku qaşo endamekî DAIŞê bû- bi doqmaqekî giran dikiuştin û ew parçeparçe dikirin û dişewitandin; li ser esasê vê parçevîdeoyê, Yekîtîya Navdewletî ya Mafên Mirovan, Navenda Mîmoryalê ya Rûsî û Navenda Sûrîyayî ya Mafên Mirovan bûn bervedarên birayê kesê qurbanî, dozek li ber dadgerîya Rûsyayê vekirin û daxwaza kolîna li vê dozê û girtina hesab ji tawankaran kirin.

Di 18ê Kanûna Paşîn a sala 2022yan de, dadgeha eyaleta Basmanîyê ya Rûsyayê doz red kir û behaneya wê ew bû ku dozdarîyê hêmanên tawanê nepeyitandine û behaneya beşdarîya welatîyên Rûsyayê di tawana kuştinê de piştrastnekirî ye. Dadgeha pêdeçûnê ya Moskovayê jî ev biryar erê kir.

Gava rêyên qanûnî li hundirê Rûsyayê nemînin, derfet heye ku diz biçe ber Dadgeha Ewropayî ya Mafên Mirovan. Biryarên vê dadgehê xwedî nirxekî yê bilind in, lê belê êdî cîbicîkirina biryaran piştî sala 2015an li Rûsyayê ne pêkan e, çimkî Parlamentoya Rûsyayê qanûnek danî ku rê dide Dadgeha Makeqanûnî ya Bala ya Rûsyayê[167] ku biryarên dadgehên navdewletî yên mafên mirovan cîbicî bike û heger wan biryaran li dij makeqanûnê bibîne, dikare wan betal bike.

## Koma Moranê ya Ewlekarî

Serê meha Kanûna Pêşîn a sala 2013an, çekdarên Koma Ehrar El-Şam a Îslamî nasnameya çeteyekî Koma Moranê ya Ewlekarî dît. Nasname ya kesekî Rûs ê bi navê Aleksî Bodîkov bû. Wî ev nasname meha Kanûna Pêşîn a 2012an girtibû, ango berî desttêwerdana eşkerekirî ya Rûsyayê di Sûrîyayê de ku di sala 2015an de dest pê kiribû. Ev bûyer delîleke din bû ku Koma Moranê ya Rûsî ji kompanîyên ewlekarî yên pêşîn bû ya ku peyman li gel hêzên Hikûmeta Sûrîyayê îmze kiribû da ku şerê dijberên hikûmetê li ser erda Sûrîyayê bike.

Li ser malpera xwe[168], Moran xwe wekî kompanîyeke ewlekarî dide nasîn a ku xizmetên ewlekarî, veguhastin, xizmetên pizîşkî, rizgarkirin, şêwirmendî, bernameyên gelemper û desttêwerdanên hestyar ên xizmetkirina berjewendîyên bala yên bikiran pêşkêş dike. Moran her wiha dîyar dike ku endamên wê, di dema pêkanîna erkên xwe de, reftar û adetên çandî yên welatê ku mêvandarîya wan kirine digirin û bi temamî pabend in bi qanûnên navdewletî û xwecihî û qanûn û pergalên dewletên ku mêvandarîya wan dikin.

---

165 Matthew Luxmoore, "Russian Private Military Companies Move to Take Over Wagner Fighters", The Wall Street Journal, 5 Sep 2023, https://www.wsj.com/world/russia/russian-private-military-companies-move-to-take-over-wagner-fighters-a568f938

166 "Nêçîrvanên Daişîyan" hêzeke taybet a Artêşa Sûrîyayê ye. Sala 2017an, piştî ku hêzên Hikûmeta Sûrîyayê di şerê Tedmurê yê Kanûna Pêşîn a 2016an de têk çûn, ev hêz bi desteka Rûsyayê hat damezrandin û bi temamî ji çekdarên xwebexş pêk tê.

167 "بوتيـن يقـر قانونـا يعرقـل إنصـاف ضحايا انتهاكات حقوق الإنسـان الـروس بالمحاكم الدوليـة"، فرانـس24، 15 كانون الأول 2015. https://tinyurl.com/3zcjjmvn

168 Moran-group.org/en/about/index

Dîsa li gor malperê, kompanî di sala 1999an de hatiye damezrandin û xizmetên ewlekarî yên parastina keştîyan û deryavanîyê li Tengava Babu'l-Mendebê û Kendava Erebî raber kirine. Kompanîyê her wiha gelek xizmet berî şerê DYAyê li dij Iraqê û piştî şer pêşkêş kirine. Navenda sereke ya Moranê li bajarê Sankt Petersburgê yê Rûsyayê ye. Serhengê di Dezgeha Ewlekarîya Federal a Rûsyayê (FSB) de, Vîyaçîslav Kalaşnîkov, ê ku tê tercîhkirin ku girêdayî Dezgeha Saloxgerîyê ya Rûsyayê ye, serkêşîya vê komê dike.

## Kompanîya Vegayê ya Xizmetên Stratejîk (Vega Strategic Services Ltd)

Di Kanûna Paşîn a sala 2019an de, Kompanîya Vegayê ya Ewlekarî rêzedîmenên bangeşeyî yên çalakîyên xwe yên li Sûrîyayê nîşan dan. Kompanîyê, wêneyên perwerdeyên xwe yên li deverên Sûrîyayê weşandin. Vîdeoyeke kompanîyê rahînerekî Rûs ê endamê kompanîyê nîşan dide. Ew rahîner ji çekdarên Koma Alayîya Qudsê ya Filistînî ya alîgira Hikûmeta Sûrîyayê re diaxive. Li nav kavilên gundekî gundewarê Helebê yê rûxandî, çekdarên vê alayîyê ji hêla rahînerên vê kompanîyê ve dihatin perwerdekirin. Vîdeoya bangeşeyî ya ku li ser malpera fermî ya kompanîyê hatiye belavkirin, dîmenên eşkere yên çekdarên kompanîyê li gel çekdarên Alayîya Qudsê ya Filistînî nîşan dide. Hin wêneyên din jî çekdarekî kompanîyê yê bi cilên leşkerî yê li pêş Şanogeha Tedmurê nîşan didin. Wêneyekî din ê çend çekdaran e ku dibe li başûrê Sûrîyayê bin.

Malpera fermî ya kompanîyê dîyar dike ku kompanî sala 2012an li Qibrisê, ji hêla kevneşervan û karmendên berê yên yekîneyên deryayî, artêş û polîsên taybet ên Ukrayna, Rûsya û Yûnanistanê ve hatiye damezrandin. Kompanî xwe wiha dide nasîn: "Kompanîyeke navdewletî ye. Xizmetên pisporane yên berfireh pêşkêş dike. Armanca wê ya sereke, destnîşankirin û pêşîgirtina li gefên ewlehî yên li ser kes û binesazîyên deverên li jêr metirsîyê ye. Yek ji wan kompanîyên kêmpeyda ye yên ku çekên xwe yên taybet, teknîkên pêşketî û alavên ewlekarîyê yên çêker û werarkarên herî gewre bi kar tîne."

## Kompanîya "Parartêşa Slavî"[169] / "A Slavic Legion"



Ev kompanîya ku pêşendamên Dezgeha Ewlekarîya Federal a Rûsyayê di sala 2012an de damezrandiye, leşkerên berê yên xwedî pisporîyeke şer dike çekdarên xwe da ku wan li derveyî Rûsyayê bide xebitandin. Ew mûçeyeke mehane ya bi qasî 5000 $ dide her çekdarekî xwe, eger nivîşkan ket wî bi 20 hezar dolarî qerebû dike û eger were kuştin 40 hezar dolarî dide.

Sala 2013an, Hikûmeta Sûrîyayê peymanek li gel Koma Moranê ya Rûsyayî îmze kir. Moran kompanîyeke ewlekarî (neleşkerî) ye. Karê wê parastina binesazîyê û parastina kesayetên pileberz e. Peymana kompanîyê li gel Hikûmeta Sûrîyayê şerê li dij DAIŞê û jinûvekontrolkirina sazîyên petrolê yên li jêr serdestîya DAIŞê li xwe digirtin, lê belê kompanî heq ji vê peywirê derneket. Ji ber vê sedemê, biryara

169 Rhys Dubin, "Russia May Soon Allow Foreigners to Officially Serve in Its Military", Foreign Policy, 11 Oct 2017, https://foreignpolicy.com/2017/10/11/russia-may-soon-allow-foreigners-to-officially-serve-in-its-military/

damezrandina Kompanîya Paratêşa Slavî[170] hat wergirtin. Ev kompanîya nû, sala 2013an, ji hêla du karmendên Kompanîya Moranê ve li Hongkongê hat tomarkirin da ku peywirê bi cih bîne. 250 endamên wê perwerdeya operasyonên êrîşker li Laziqîyayê dîtiye û paşê bo parastina zevîyên petrolê yên Dêra Zorê hatin erkdarkirin. Lê belê piştî ku ji ber kêşeyên kordînasyonê yên li gel Hikûmeta Sûrîyayê û kêşeyên din ên lojîstîk ên girêdayî wergirtina çekên kevn û hindik, gelek kuştîyên vê kompanîyê di pevçûnên li dij DAIŞê de çêbûn û di encamê de karê wê li Sûrîyayê rawestîya[171].

Li gor malpera kompanîyê, ew xizmetên berevanî û pêşparêzîyê yên ji bo parastina avahîyên aborî, parzûngehên petrolê, bender, karxane û avahîyan, her wisa parastina karwanên lojîstîkan pêşkêş dike. Lê belê karê wê berevajî van peywiran bû, çimkî ji bilî xizmetên parastina zevîyên petrolê, gelek delîl dîyar dikin ku ew sala 2013an bi awayekî aktîv tev li şerên parêzgeha Dêra Zorê bû.

## Rêxistina Hevparîya Civakî ya Yekbûyî[172] (E. N. O. T)

Ev koma han sala 2011an ji hêla neteweperistê Rûs, Îgor Manguşêv, ve hat damezrandin. Sala 2014an tev li şerê Rûsyayê yê li dij Ukraynayê bû û beşdarîya çalakîyên leşkerî yên li Sûrîyayê[173] û herêma Nagorno Karabaxê ya ku Azerbaycanê vegirt, kir. Kompanîyê herêma Donbasê ya Ukraynayê ji xwe re kir navend. Ji sala 2015an ve kompanîyê kampên xwe yên perwerdekirinê li Sirbistan û Rûsyaya Spî vekirin û çekdarên ji hemû temenan, di nav de zarokên ji 12 heta 18 salî, di nav refên xwe de kirin çekdar. Belam têkilîya vê komê li gel Kremlînê xirab bû û çend berpirsên wê, di nav de berpirsê darayî Vladîmîr Morozov, bi tawanbarîya şantajê hatin girtin. Paşê, sala 2022yan, serkêşê rêxistinê, Roman Telenkevîç, bi sazkirina civateke tawankar û pêkanîna şantajê, gefxwarina kuştinê û gihandina ziyaneke tirsnak bo laşê mirovan hat tawanbarkirin. Di serê Sibata 2023yan de, dema Manguşêv li Ukraynayê bû, guleyeke kujer li patika serê wî ket.

170 “Band of Brothers: The Wagner Group and the Russian State”, The Center for Strategic & International Studies, 21 Sep 2020, https://www.csis.org/blogs/post-soviet-post/band-brothers-wagner-group-and-russian-state

171 “محلل أمني تركي: موسكو ستزيد اعتمادها على المرتزقة الروس في سوريا بعد انسحابها”، ترك برس، 2 كانون الأول 2017، https://www.turkpress.co/node/42533

172 Paul Goble, “Russian Nationalist Group, Acting as a Private Military Company, Worries Kremlin”, 15 Nov 2018, https://jamestown.org/program/russian-nationalist-group-acting-as-a-private-military-company-worries-kremlin/

173 Dmitry Nikitin, Rostislav Bogushevsky, Alina Volchinskaya, “The FSB began detaining members of the PMC E.N.O.T”, Dailystorm.ru, 9 Nov 2018, (Russian) https://dailystorm.ru/obschestvo/fsb-nachala-zaderzhivat-uchastnikov-chvk-e-n-o-t

## Redut-Antiterror[174]

Ev kompanî, sala 2008an, ji hêla leşkerên berê yên Dezgeha Saloxgerîyê ya Derveyî ya Rûsyayê, hêzên esmanî û yekîneyên Wezareta Berevanîyê yên Rûsyayê[175] ve hat damezrandin[176]. Ev leşker xwedî pisporîyeke şer a li derveyî welêt an jî endamên hêzên aştîparêzîyê bûn. Kompanîya Redutê li Ukraynayê kar kir û ji bo parastina avahîyên petrolê û avahîyên leşkerî û dîplomatên Rûs tev li gelek operasyonên herêma Donbasê ya Ukraynayê, Iraq, Somalya, dewletên Deryaya Karîbê û Endonezyayê bû. Redut xwedî makîneyên zirxdar, tifingên sivik û navincî û alavên leşkerî yên sivik e. Wan ji bo cîbicîkirina peywirên şer ên lezgîn bi kar tîne. Lê belê wê di şerê li hember Ukraynayê de ziyanên mezin dîtin û êdî şiyanên wê li hember kompanîyên din ên mîna Wagnerê qels bûn. Gencîneya DYAyê jî Redut derbasî lîsteya hêzên çete yên Rûsyayê kir û êdî li gor sizayan, nabe ev kompanî tu pereyan li ser erda DYAyê bikişîne yan bişîne yan jî tu milkanîyên wê li DYAyê hebin. Li Sûrîyayê, Redut beşdarî parastina avahîyên Kompanîya Gazpromê bû ya ku Gennadî Tîmçenko xwedîyê wê bû lê belê Kremlînê dest danî ser. Komapnîya Redutê bi rengekî çalak xelkê li ser torên medyaya civakî dixe xefikên leşkerkirinê. Mercên wê ew in ku divê temenê kesê serîlêder ne kêmî 25 salan be û xwedî pisporîyeke leşkerî yan jî pisporîya di ajanseke cîbicîkirina qanûnê de be[177].

## Koma Antiterror-Orelê[178]

Sala 2003yan ji hêla leşkerên berê yên Artêşa Rûsyayê ve hat damezrandin. Operasyonên xwe yên pêşîn li Iraqê pêk anîn; di rakirina mayînan û parastina binesazîya enerjîyê de. Sala 2013an, endamên wê Parartêşa Slavî damezrand. Parartêşa Slavî gava pêşîn a damezrandina Kompanîya Wagnerê bû û beşeke sereke ya bingeha wê bû. Ew her wiha bingeha Kompanîya Redut-Antiterrorê bû.

174 Matthew Luxmoore, Benoit Faucon, "Russian Private Military Companies Move to Take Over Wagner Fighters", The Wall Street Journal, 5 Sep 2023, https://www.wsj.com/world/russia/russian-private-military-companies-move-to-take-over-wagner-fighters-a568f938

175 Nicholas Chkhaidze, "PMC Redut: The Wagner Group's Potential Replacement", Geopolitical Monitor, 30 Aug 2023, https://www.geopoliticalmonitor.com/pmc-redut-the-wagner-groups-potential-replacement/

176 Ffi.no/en/

177 Mark Krutov, Sergei Dobrynin, "Who's Who Among Russia's Mercenary Companies", Radio Free Europe/Radio Liberty, 23 May 2023, https://www.rferl.org/a/russia-other-mercenary-companies-ukraine/32424520.html

178 Filip Bryjka, "Russian "Contractors" In the Service of the Kremlin", Warsaw Institute, 14 Aug 2019, https://warsawinstitute.org/russian-contractors-in-the-service-of-the-kremlin/

## Koma[179] RSByê (RSB-Group)[180]

Sala 2011an, bo yekem car, wekî rêxistineke neqezencbar li Moskovayê hat tomarkirin. Ji hêla efserên berê yên Saloxgerîya Rûsyayê û Dezgeha Ewlekarîya Federal a Rûsyayê ve hat damezrandin[181]. Ev kom beşdarî çalakîyên parastina keştîyên li deryayên Afrîkayê yên li beranber beravên Somalyayê û li Kendava Gîneyê bû. Komê her wiha mayînên li Lîbyayê rakirin û beşdarî vegirtina Nîvgirava Kirimê ya sala 2014an bû.

## Koma Toranê

Çirîya Pêşîn a sala 2017an, navgînên ragihandinê hevdîtina rojnameyeke Rûsî ya li gel çekdarekî weşand[182]; tê de dihat gotin ku wî çekdarî li jêr navê kompanîyeke leşkerî ya bi navê Toranê li Sûrîyayê şer kiriye. Li gor vê çavkanîyê, Toran û Wagner kompanîyên leşkerî û ewlekarî yên herî giring ên Rûsyayê ne. Koma Toranê wiha hatiye danasîn: “Tabûreke şervanên Misilman ên ji dewletên Asyaya Navîn û bakurê Kafkasyayê ye.” “Toran” tê wateya (Erda Tirkan) û li vir -bi giştî- amaje bi Asyaya Navîn tê kirin. Lê bi her halî bawerîyên der heqê Toranê de piştrastnekirî ne, tew hin kes dibêjin tu komeke bi vî navî ji binî ve tune ye û wê wekî bangeşeyeke ji bo ragihandinê bi nav dikin.

## Kompanîya Mertalê

Di Hezîrana 2019an de, ji ber topbarandina devereke ku 50 kîlometreyî dûrî Zevîya Tiwênanê ya Gazê ya li Himsê ye, sê endamên kompanîya ewlekarî ya Rûsî ya bi navê Shieldê, ango Mertal, hatin kuştin. Êdî ev kompanî dawîtirîn kompanîya taybet e ya ku rolek di çalakîyên leşkerî yên li Sûrîyayê de gerand.

Li gor raporeke Rojnameya Novaya Gazetayê ya Rûsî, “hejmara endamên Kompanîya Mertalê li her devereke Sûrîyayê ji 25 heta 30 endamî ye û bi giştî ji 200 heta 300 endamî ye. Dema nobedarîya her tîmekê sê meh in û dibe ku were nûkirin. Sala borî, mûçeya mehane gihaşt 180 hezar rupelî (nêzî 2800 $), lê belê paşê sêyekek jê hat kêmkirin.”[183]

179 “Private Russian military companies are multiplying - and so are the Kremlin’s problems”, France24, 16 Jul 2023, https://www.france24.com/en/europe/20230716-private-russian-military-companies-are-multiplying-%E2%80%93-and-so-are-the-kremlin-s-problems

180 Tor Bukkvolla, Åse G. Østensen, “Russian Use of Private Military and Security Companies: The implications for European and Norwegian Security”, Norwegian Defence Research Establishment (FFI), 11 Sep 2018, https://www.cmi.no/publications/6637-russian-use-of-private-military-and-security

181 Rsb-group.org.

182 Ruslan Leviev, “Turan - a new private military company fighting in Syria or an elaborate hoax?”, Conflict Intelligence Team, 6 Jan 2018, https://citeam.org/turan-pmc/?lang=en

183 “الشركات الأمنية العسكرية الروسية الخاصة تنشط في سوريا”، ديلي صباح، 1 آب 2019، https://tinyurl.com/yc49jr7v

Nûçeyên pêşîn ên li barê Kompanîya Mertalê[184] vedigerin sala 2018an. Navenda wê li gundewarê Moskovayê ye. Li gor çavkanîyên Rojnameya Novaya Gazetayê, karê vê kompanîyê ew e ku pênc deverên Kompanîya Stroytransgazê ya Rûsî biparêze. Ev kompanîya gazê ji sala 2008an ve ya karsazê Rûs Gennadî Tîmçenko ye, ji sala 2000î ve li Sûrîyayê kar dike û xebatên wê, kanên fosfatê yên rojhilatî yên li derdora Tedmurê, du parzûngehên gazê û borîyeke gazê ya bi dirêjîya 139 kîlometreyan li xwe digire.

Tu tank an topavêj an jî roketên Kompanîya Mertalê nînin. Çekên wê yên giran çekên eyara 7.12 mm derbas nakin. Ev kompanî tev li tu şeran jî nebûye û karê wê di çarçoveya pasevanîya adetî ya kompanîyên ewlekarî de maye.

# 5. Kompanîyên Ewlekarîyê-Leşkerî yên Ne-Rûsyayî

## 5.1. Kompanîyên Ewlekarîyê-Leşkerî yên Tirkîyayî

### Kompanîya SADATê ya Leşkerî ya Tirkîyayî

Sala 2012an, li Stenbolê, hat damezrandin û heman salê dest bi karê xwe yê li Sûrîyayê kir. Li gor raporeke malpera Africa Intelligenceê[185] ya Fransizî ku sala 2020an weşandibû, "Kompanîya SADATê çekdarên opozisyona Sûrîyayî perwerde kirine. Komên leşkerî yên Sûrîyayî yên ku vê kompanîyê ew perwerde kirine, li ser hesabê Sûrîyayê, dilsozên Tirkîya û Erdogan in." Piştî ku Tirkîyayê, sala 2016an, operasyona xwe ya bi navê "Mertalê Feratê" li Sûrîyayê da destpêkirin, SADATê serperiştîya prosesên perwerdekirin û amadekirina Artêşa Niştimanî ya Opzisyona Sûrîyayê kir.

Her çendî adet ew e ku kompanîyên leşkerî yên taybet ji ber sedemên aborî kar dikin û dûrî rênîşandêrîyên siyasî ne[186]; Kompanîya SADATê jî mîna kompanîyên Rûsyayê yên li Sûrîyayê ji bo dewleta xwe kar dike, wate SADATê berjewendî û siyaseta Hikûmeta Tirkîyayê meşandin. SADAT xizmetên xwe pêşkêşî hêzên leşkerî û hêzên polîsan ên dewletên hevalbend an hevpeymanên Tirkîyayê ne dike. Damezrînerê wê, Adnan Tanriverdî, eşkere kir ku armanca wan a damezrandina vê kompanîyê, xizmetkirina dewletên Îslamî ye yên ku hêzên leşkerî yên Tirkîyayê nikarin xwe bigihînin wan. Kompanî dîyar dike ku qezenckirin ne armanca wê ya tenha ye û ew dixwaze xizmeta îdeala herî bala bike ku ew jî guhartina hevsengîya hêzan a ji bo berjewendîya Îslamê ye[187].

184 "We were afraid of disrupting the operation to free the survivors: After the Ministry of Defense announced the death of Russian officers who disappeared in Syria on February 22, Novaya publishes details of what happened that day", Novaya Gazeta, 27 Mar 2019, (Russian) https://novayagazeta.ru/articles/2019/03/26/79999-my-boyalis-sorvat-operatsiyu-po-osvobozhdeniyu-vyzhivshih

185 "Border protection: Turkish military company SADAT's discreet charm offensive", Africa Intelligence, 1 Nov 2022, https://www.africaintelligence.com/west-africa/2022/11/01/border-protection-turkish-military-company-sadat-s-discreet-charm-offensive,109840510-art

186 Matt Powers, "Making Sense of SADAT, Turkey's Private Military Company", War on the Rocks, 8 Oct 2021, https://warontherocks.com/2021/10/making-sense-of-sadat-turkeys-private-military-company/

187 حسام خضر، "شركة "سادات" التركية: بين فكّي الاتهامات وحلم الكونفدرالية الإسلامية"، نون بوست، 18 كانون الثاني 2023، https://www.noonpost.com/46312/

Li gor malpera fermî ya SADATê, kompanî ji bo pêşkêşkirina xizmetên perwerdekirina leşkerî û rawêjkarîyên berevanîyê û kirîna cebilxaneyê ji bazarên navdewletî hatiye damezrandin. Malper her wiha dîyar dike ku tu hêzên leşkerî yên şer ên SADATê nînin û tev li tu çalakîyên nerewa nabe. Lê belê hin alî dibêjin ku ew hêzên leşkerî yên veşartî yên Hikûmeta Tirkîyayê ne û dibe ku yekîneyên nefermî yên "dewleta kûr" a heyama berî Erdogan bin[188].

## Kompanîya Malhamayê ya Tektîkî




Ji nav kompanîyên navdewletî yên ku li Sûrîyayê kar dikin, navê Kompanîya Malhamayê ya Tektîkî[189] derket pêş. Ev kompanî sala 2016an hatiye damezrandin û ji wê demê ve, xebatên şerkirin, perwerdekirin û rawêjkarîyê -bi rêya peymanên kar- li deverên jêr serdestîya opozisyona Sûrîyayî ya çekdar dike, nemaze li gel komên mîna Cebhet Fetih El-Şam (Cebhet El-Nusrayê) û Partîya Îslamî ya Tirkistanî[190]. Navenda kompanîyê li Ozbekistanê ye û xizmetên xwe raberî cîhadîyên Sunî bi tenê dike. Endamên wê xizmetên perwerdekirina leşkerî û bikaranîna çekan pêşkêş dikin. Çekdarên ji hêzên taybet jî di nav refên wê de hene. Sala 2017an, endamên wê, komên Ehrar El-Şam û Cebhet Fetih El-Şam li ser avêtina roketên RPGyê, êrîşkirina di nav tîmên leşkerî de û operasyonên din ên êrîşbirin û berevanîyê perwerde kirin[191]-[192].

188 Mahmut Cengiz, Layla Hashemi, Vladimir Semizhanov, "Alternative Ways to Seek Regional and Global Influence: How Shadowy Organizations Serve the Interests of Turkey, Iran, and Russia", Small Wars Journal, 04 Jul 2022, https://smallwarsjournal.com/jrnl/art/alternative-ways-seek-regional-and-global-influence-how-shadowy-organizations-serve

189 "Global Disruption of Three Terror Finance Cyber-Enabled Campaigns", US Department of Justice, 13 August 2020, https://www.justice.gov/opa/pr/global-disruption-three-terror-finance-cyber-enabled-campaigns

190 Yavor Raychev, "Malhama Tactical: A New Disturbing Trend in Jihad Conflicts", 27 Nov 2017, https://www.academia.edu/37814133/MALHAMA_TACTICAL_A_NEW_DISTURBING_TREND_IN_JIHAD_CONFLICTS

191 Alessandro Arduino, Nodirbek Soliev, "Malhama Tactical: The Evolving Role of Jihadist Mercenaries in the Syrian Conflict", INSIGHTS No. 262, 22 Jun 2021, https://mei.nus.edu.sg/wp-content/uploads/2021/06/Insight-262-Alessandro-Arduino-and-Nodirbek-Soliev.pdf

192 Sean McFate, "Mercenaries and War: Understanding Private Armies Today", National Defense University Press, 4 Dec 2019,https://ndupress.ndu.edu/Media/News/Article/2031922/mercenaries-and-war-understanding-private-armies-today/

## 5.2. Kompanîyên Leşkerî yên Amerîkayî

Raporên ragihandinê dîyar kir ku hêzên DYAyê li gel peymandarên sivîl xebitîye. Sala 2019an, hevdemî biryara DAYyê ya kêmkirina hejmara leşkerên xwe li Bakurrojhilatê Sûrîyayê, damezrînerê Kompanîya Blackwaterê[193] ya Leşkerî dîyar kiribû ku dibe kompanîyên leşkerî yên taybet cihê yekîneyên Artêşa Amerîkayê yên dê ji Sûrîyayê vekişin bigire, da ku ewlehîya hevalbendên DYAyê, ango Hêzên Sûrîyaya Demokratîk, bê misogerkirin û rê li pêşketina hêzên Îranê yên li herêmê were girtin.

Li gel tê texmînkirin ku hejmara leşkerên DYAyê yên li Sûrîyayê nêzî 900 leşkerî ye, General James B. Jarrard, sala 2017an, eşkere kir ku hejmara leşkerên DYAyê yên li Sûrîyayê nêzî 4000 leşkerî ye. Wer xuya ye ku wî peymandarên kompanîyên leşkerî yên Amerîkayî jî di nav de hesab kirine[194]. Sala 2018an, Pentagonê yekem rapora[195] ku li hebûna peymandarên sivîl ên DYAyê li Sûrîyayê mikur tê weşand. Raporê dîyar kir ku nêzî 5500 peymandarên DYAyê li Iraq û Sûrîyayê hene; nîvê wan welatîyên DYAyê ne û nîvê din welatîyên dewleteke sêyem in ku peywirên destekdar ên neşerker pêk tînin.

Sibata 2021ê, hejmara peymandarên ewlekar ên li gel DYAyê giha 1413 kesan. Piranîya wan peywirên destekdar ên neşerker[196] pêk tanîn. Sê mehên dawîn ên sala 2022yan, Wezareta Berevanîyê ya DYAyê got ku 941 peymandarên ewlekar li Iraq û Sûrîyayê hene, belam wê negot ka kîjan ji wan peymandarên ewlekar ên çekdar in[197].

Adara 2023yan, dronekê êrîşî baregeheke Hevpeymanîya Navdewletî ya li dij DAIŞê ya li nêzî bajarê Hesekê yê Bakurrujhilatê Sûrîyayê kir û peymandarekî Amerîkayî kuşt û pênc kes birîndar bûn, di encamê de balafirên şer ên DYAyê êrîş birin ser armancên girêdayî Îranê yên li Sûrîyayê[198]. Ji bilî Kompanîya Castle Internationalê, navê tu kompanîyeke leşkerî ya Amerîkayî li Sûrîyayê eşkere nebûye.

---

193 Richard Hall, "US troops in Syria could be replaced by private contractors, Blackwater founder Erik Prince says", The Independent, 15 Jan 2019, https://www.independent.co.uk/news/world/middle-east/syria-us-troop-withdrawal-private-contractors-blackwater-erik-prince-trump-military-a8729121.html

194 Ted Galen Carpenter, "Syria episode shows how contractors still used to fight America's wars", Responsible Statecraft, 31 Mar 2023, https://responsiblestatecraft.org/2023/03/31/syria-episode-shows-how-contractors-still-used-to-fight-americas-wars/

195 Joshua Keating, "Forever Wars Don't End. They Just Go Corporate", Slate, 24 Jan 2020, https://slate.com/news-and-politics/2020/01/military-contractors-iraq-kenya-syria.html


196 Ted Galen Carpenter, "Syria episode shows how contractors still used to fight America's wars", Responsible Statecraft, 31 Mar 2023, https://responsiblestatecraft.org/2023/03/31/syria-episode-shows-how-contractors-still-used-to-fight-americas-wars/

197 Courtney Kube, Peter Alexander and Mosheh Gains, "U.S. contractor killed, 5 service members and contractor wounded in suicide drone strike in Syria", NBC News, 24 Mar 2023, https://www.nbcnews.com/politics/national-security/us-contractor-killed-service-members-wounded-suicide-drone-syria-rcna76453

198 Heman çavkanîya borî.

## Kompanîya Castle Internationalê

Navenda wê li bajarê Scottsdalê yê Eyaleta Arîzaonayê ye. Sala 2014an[199] peymanek ji bo perwerdekirina Yekîneyên Parastina Gel îmze kiriye. Li gor navgînên ragihandinê, kompanîya ku xwe li ser malpera xwe ya înternetê wekî "kompanîya pêşeng a xizmetên leşkerî li bazarên navdewletî" dide nasîn, teqez dike ku şaxê wê yê bi navê "Special Projects"ê niha xizmetên xwe li Afrîka, Iraq û Sûrîyayê raber dike. Kompanî her wiha dîyar dike ku ew bi rêya karmendên xwe yên pispor xizmetên taybet raberî bikirên xwe yên li deverên pir tirsnak ên li Rojhilata Navîn û herêmên din dike. Li gor kompanîyê, ew prosesên derandinê û dabînkirina alîkarîyên pizîşkî li deverên şer dimeşîne.



FERMANDARIYA GIŞTÎ YA YPG
القيادة العامة لوحدات حماية الشعب

نحن في وحدات حماية الشعب YPG، في روج افا سوريا، نرغب في التعاقد مع القلعة الدولية (Castle International LLC of Arizona, USA) بغرض عقد إتفاقية طويلة الأجل في مجال خدمات الطب العسكري ومسألة الخبرات و الدعم اللوجستي.

We, People's Protection Units (YPG) of Rojava-Syria, wish to engage with Castle International LLC of Arizona, USA for the purpose of a long-term contractual agreement in the eservices of combat medical support and logistics subject matter expertise.

Ajansa Anadoluyê raporek li ser malpera xwe ya fermî weşand, rapor dibêje: "Di malpera Kompanîya Castle Internationalê de, belgeyek der barê lihevkirineke li gel Yekîneyên Parastina Gel de heye. Belge dibêje: Em dixwazin pêwendîyên xurt ên di warê alîkarîyên pizîşkî yên şerker û xizmetên lojîstîk de ên ji bo danîna peymaneke demdirêj li gel Kompanîya Castle Internationalê deynin."[200]

199 Ersin Çelik, "US sends Castle International mercenaries to fight alongside YPG/PKK in Syria", Yeni Şafak, 17 Sep 2019, https://www.yenisafak.com/en/world/us-sends-castle-international-mercenaries-to-fight-among-ypg-pkk-in-syria-3441294

200 "Castle International. Small bipod in the Syrian game, or the new American PMC", Topwar.ru, 22 Sep 2018, https://en.topwar.ru/147319-castle-international-melkie-soshki-v-sirijskoj-igre-ili-novaja-amerikanskaja-chvk.html

# 6. Kompanîyên Parastina Ewlehî

Kompanîyên ewlehî yên xwecihî yên taybet roleke giring di dabînkirina alîkarî, destekdan û xizmetên lojîstîk bo kompanîyên ewlekarî û leşkerî de gerand. Her wiha beşdarî prosesên leşkerkirina Sûrîyayîyan bûn, da ku li jêr sîya Rûsyayê li derveyî welatê xwe şer bikin. Îranê jî kompanîyên ewlehî yên taybet dan xebitandin[201] da ku hêz û desthilatîya xwe xurt bike û hebûna xwe ya li deverên stratejîk ên mîna rêya lezgîn a navbera Bexda û Şamê ya li biyabana rojhilatî û bajarê Şamê bi xwe biparêze.

Ev kompanî, hevdemî siyaseta Sûrîyayê ya piştî sala 2000î ku berê xwe dabû aborîya bazarê û di sektora parastin û ewlehîyê de kar dikir, derketin holê. Kompanîyên nûhatî wekî kompanîyên bazirganî dihatin qebûlkirin û pê re destûra xwe ya xebatê ji parêzgehê yan jî wezareta bazirganîyê werdigirtin. Helbet erêkirina şaxê ewlekarîya siyasî ya girêdayî Wezareta Karûbarên Hundir jî gerek bû. Karê van kompanîyan di çarçoveya pasevanîya di nava Şam û Helebê de mabû. Heta dawîya sala 2007an, hejmara van kompanîyan li Şamê gihabû 7an[202] û li Helebê gihabû 2yan. Sala 2008an, Kompanîya El-Bustanê jî li wan zêde bû da ku pasevanîya pîrozbahîyên "Şam Paytexta Çanda Erebî ye" bike. Lê belê piştî sala 2011an, gava ji 45 hezar polîsan (li gor serjimarîya sala 2011an[203]), zêdeyî 15 hezar polîs ji Wezareta Karûbarên Hundir veqetîyan -ku piranîya wan girêdayî Hêzên Ewlehîya Hundirîn bûn- û hevdemî gurbûna agirê operasyonên leşkerî û ewlehî; pêdivîya bi hêzên zêdetir pêwîsttir bû. Ji ber van sedeman, biryarnameya 55an[204] hat wergirtin. Li gor vê biryarnameyê, rê hat dayîn ku milîs li Sûrîyayê bixebitin û bêyî ku li hêzên şaxên ewlekarîyê yên hikûmetî vegerin an hemahengîyê li gel wan bikin, hêza leşkerî -li gor peymana îmzekirî- bi kar bînin. Biryarnameyê ev kompanî xistin jêr serwerîya şaxê kompanîyên taybet ê Wezareta Karûbarên Hundir. Li gor biryarnameyê, kompanîyê destûra xebatê bo salekê werdigirt û ev dibû ku ev destûr sal bi sal were nûkirin, çekên xwe bi erêkirina Wezareta Karûbarên Hundir ji derve tanîn. Lê eger avahîyên ku gerek e bên parastin dûredest û derveyî bajaran bûna, gerek bû erêkirina Wezareta Berevanîyê bo anîna çekên sivik û navincî hatibûya wergirtin. Ev kompanî li gor hejmara peymandar û karmendan hatin polandin: Kategorîya yekem kompanîyên ku pasevanên wan ji 800î zêdetir in, kategorîya duyem kompanîyên ku pasevanên wan ji 300 heta 500 pasevanî ne û kategorîya sêyem kompanîyên ku pasevanên wan ji 300 pasevanî kêmtir in.

Lêkolerên navendê da pey hejmara kompanîyên tomarkirî yên ku destûrên xebatê li gor peywir û xizmetên xwe yên pêşkêşkirî wergirtine. Lêkolîna ku sala 2021ê çûbû serî, şekere kir ku hejmara kompanîyên ewlehî yên li Sûrîyayê yên ku li bal Wezareta Karûbarên Hundir tomarkirî ne, gihaye ji 75 heta 80 kompanîyî. Wekî din, eşkere bû ku tomarnameya bazirganî ya hin kompanîyan hatiye betalkirin, mîna Kompanîya Elfayê ya Parastin û Pasevanîyê û Pergalên Ewlehîyê û Kompanîya Falconê ya Pergalan û Xizmetên Ewlehîyê ya Koma Mexlûf a ku ketibû ber sizayên aborî. Lêkolînê her wiha pircelebîya peywir, taybetmendî û sponserîyên van kompanîyan dîyar kiriye.

201 Navvar Saban, "Factbox: Iranian influence and presence in Syria", Atlantic Council, 5 Nov 2020, https://www.atlanticcouncil.org/blogs/menasource/factbox-iranian-influence-and-presence-in-syria/

202 منهل باريش، "الشركات الأمنية الخاصة في سوريا: وكلاء جُدُد في خدمة النظام"، 28 آذار 2021، https://tinyurl.com/4s4mtmp3

203 وزارة الداخليّة في سورية..الواقع وضرورات الإصلاح" (ملف)، مركز عمران للدراسات الاستراتيجية"، https://tinyurl.com/4uw4br3n

204 المرسوم التشريعي 55 لعام 2013 - منح الترخيص لشركات خدمات الحماية والحراسة الخاصة"، 5 آب 2013"، https://tinyurl.com/mr2cjewv

Kompanîyên ku herî zêde kes ji bo şerkirina li hundirê Sûrîyayê yan şerkirina wekî çeteyan li derveyî Sûrîyayê bi çek kirine, ev in:

| Navê kompanîyê | Herêm | Zanyarî | Peywir û xizmet |
|---|---|---|---|
| **Kompanîya El-Qel'ayê ya Parastin, Pasevanî û Xizmetên Ewlehîyê C. S. P** | Şam - Hims - Laziqîya - Tertûs | Kompanîyeke ewlehî ya taybet a ji kategorîya yekem e ji 800 kesî zêdetir | Gelek alî teqez dikin ku roleke Îranê di vê kompanîyê de heye, çimkî endamên kompanîyê serîlêderên Îranî diparêzin. |
| **Kompanîya El-Fecrê ya Parastinê** | Şam - Hims - Laziqîya - Tertûs | Sala 2018an hat damezrandin û destûra xwe li jêr hejmara 21. Q.N ji Wezareta Karûbarên Hundir wergirtiye | Ji alîyê Lorens Helawe ve tê birêvebirin û bi awayekî rasterast girêdayî Şaxê Saloxgerîya Leşkerî ya Hikûmeta Sûrîyayê ye |
| **Kompanîya El-'Erînê ya Xizmetên Ewlekarîyê** | Şam - Hims - Laziqîya | Navê kompanîyê hat guhartin û bû Kompanîya El-Cebelê ya Xizmetên Parastin û Pasevanîyê | Ji hêla Usama El-Malikî ve yê nêzî Şaxê Saloxgerîya Leşkerî ya Hikûmeta Sûrîyayê tê birêvebirin |
| **Kompanîya El-Cebelê** | Li hemû parêzgehan | Berê Kompanîya El-'Erînê ya Xizmetên Ewlekarîyê | Ji hêla Usama El-Malikî ve yê nêzî Şaxê Saloxgerîya Leşkerî ya Hikûmeta Sûrîyayê tê birêvebirin |
| **Kompanîya Niştimanî ya Parastin û Pasevanîyê** | Şam - Hims | Xizmetên xwe pêşkêşî saziyên giştî û taybet û hemû sektor û dezgehên aborî dike. | Parastina avahîyên mîna (karxane - avahîyên petrolê - avahîyên bazirganî …) veguhastina pereyan - parastina karwanên madeyan û sotemenîyê |
| **Kompanîya Peywirên Parastinê û Pasevanîyên Ewlehî** | Heleb | Koma Qatircî ya Navdewletî | Kompanîya Xeyyas Qatircî û Ebdulah Qatircî ye. Nêzî hêzên ewlekarîyê ye û gelek binpêkirin kirine. |

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Proguard** | Şam | Pêşkêşkirina rawêjkarîyên ewlehî | Kompanîya Reîf Hîlal û Husam Reîf Hîlal e. |
| **Kompanîya El-Dir'ê ya Pasevanîyan û Xizmetên Ewlekarîyê** | Laziqîya - Tertûs | | Kompanîya Samir Foz e. Ev kes nêzî hêzên ewlekarîyê yên Sûrîyayê ye û ketiye ber sizayên aborî. |
| **Kompanîya Elîbê ya Rawêjkarîyên Ewlekarîyê** | Heleb | Ev kompanî ya Koma Qatircî ye | Kompanî ya Husam û Mihemed Qatircî ye û bi rengekî rasterast ji hêla Rêberîya Nivîsgeha Operasyonan a Parartêşa Çarem a Artêşa Sûrîyayê ve ye. |
| **Kompanîya Qasîyûnê ya Xizmetên Ewlekarîyê** | Şam - Laziqîya | Ji hêla Rîmon 'Eyn El-Şayba ve tê birêvebirin | Kompanî ya Koma Ramî Mexlûf a Bazirganî ye û ketiye ber sizayên aborî |
| **Kompanîya El-Husnê ya Xizmetên Pasevanîyê û Rawêjkarîyên Ewlekarîyê** | Şam - Laziqîya | Destûra xebata wê hat betalkirin | Kompanî ya Koma Ramî Mexlûf e û ketiye ber sizayên aborî |
| **Kompanîya Falconê ya Xizmetên Ewlehîyê** | Şam - Laziqîya | Destûra xebata wê hat betalkirin | Kompanî ya Koma Ramî Mexlûf e û ketiye ber sizayên aborî |
| **Kompanîya Elfayê ya Xizmetên Pasevanîyê** | Şam - Laziqîya | Kompanî ya Koma Ramî Mexlûf e û ketiye ber sizayên aborî | Kompanî ya Koma Ramî Mexlûf e û ketiye ber sizayên aborî |
| **Kompanîya El-Seyadê ya Xizmetên Ewlekarîyê** | Siwêda - Tertûs - Hema | Ev kompanî giranîyê dide leşkerkirina endaman ji parêzgeha Siwêdayê da ku wan ji bo şerkirinê bişîne Lîbyayê | Ev kompanî ya Fewwaz Mîxaêl Cercis e. Ev kes li bajarê Miherdayê yê parêzgeha Hemayê rûdine û ji ber girêdana wî ya xurt a bi Kompanîya Wagnerê ve, serokê Rûsyayê, Putîn, ew xelat kiribû. |

# Qewîtî

## Hikûmeta Sûrîyayê

* Hikûmet li tawan û ziyanên ku ji ber leşkerkirin û bikaranîna çeteyan li Sûrîyayê gihane welatîyên sivîl, mikur bê. Her wiha pêngavên lezgîn ên qerebûkirinê bên avêtin, ziyan bên cebarkirin, saxlemkirina gewdeyî û derûnî bê kirin û rehabîlîtasyona kesane li gor dilê qurbanîyan bê kirin.
* Hemû xebatên bangeşe û leşkerkirinê û çalakîyên civakî yên komên çeteyan li Sûrîyayê, nemaze li parêzgehên Hesekê û Dêra Zorê, bên qedexekirin.
* Betalkirina biryarnameya 55em a ku destûrê dide xebata kompanîyên taybet ên xizmetên parastin û pasevanîyê û danîna qanûneke nû ya birêxistina karê van kompanîyan û hebûna endamên wan û tomarkirina wan bi rengekî qanûnî. Qanûna nû behsa perwerdeya nasandina qanûna navdewletî ya mirovî û mafên mirovan bike û vê yekê bike mercekî bingehîn ê bidestxistina belgeya tomarkirinê.
* Rê bê dayîn ku tîma pişkinîna bikaranîna çeteyan serî li Sûrîyayê bide û karê wê yê çavdêrîkirina defter û tomarnameyên Wezareta Karûbarên Hundir û tomarnameyên firokexaneyan bê hêsankirin da ku çavkanî û rêyên leşkerkirin û veguhastinê û berpirsên bikaranîna çeteyan û çalakîyên girêdayî wan bên dîyarkirin, kompanîyên leşkerî û ewlekarî bên eşkerekirin û bandora wan a li mafên mirovan bê destnîşankirin da ku em dawîyê bigihêjin hesabgirtina sizayî û sivîl û qerebûkirinê.

## Neteweyên Yekbûyî û Rêxistinên Navdewletî

* Neteweyên Yekbûyî peymaneke navdewletî ya nû ya tawankirina çeteyan îmze bike û danasîneke nû ya yekbûyî û gelemper a hemû şêwazên nû yên mîna çeteyên sayber (cyber) bê danîn.
* Komîteya Qanûna Navdewletî ya Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî û Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor bo serrastkirina Benda 47an a protokola yekem a lihevkirinên Cenevê, tawankirina bikaranîna çeteyan; da ku êdî sizakirina çeteyan di çarçoveya bêparkirina ji rewşa dîlgirtinê û parêzvanîya vê rewşê de bi tenê nemîne.
* Komîserîya Neteweyên Yekbûyî ya Mafên Mirovan bi rengekî berfireh û wekî karekî pêşîn, bandorên neyînî yên çeteyan û yên kompanîyên leşkerî û ewlekarî yên taybet bi mafên mirovan bide nasîn. Her wiha rola wan a di têkbirina hêminîya dewletan û astengkirina serwerîya niştimanî de bê dîyarkirin, nemaze gava ev kompanî çalakîyên xwe di şer û pevçûnan de dikin.

## Civaka Navdewletî

* Dupatkirina berpirsyarîya dewletan ji ber karên kompanîyên leşkerî yên ku li paş perdeyan girêdayî wan in. Her wiha bê teqezkirin ku hevkarîya leşkerî û xizmetên rawêjkarîyê yên kompanîyên taybet di warê ewlehîyê de -li ser asta navdewletî-tadeyê negihînin mafên mirovan û wan binpê nekin.
* Danîna çarçoveyeke gelemper a li ser asta niştimanî, herêmî û navdewletî bo têgihaştina sazgêrîyên qanûnî û sazgêrîyên din ên çavdêrîkirina karên çeteyan. Her wiha bilindkirina asta hevkarîyên dualî, herêmî û navdewletî, bi taybetî di birêvebirin û çavdêrîkirina sînoran de û kolîna li hoykarên siyasî, aborî û civakî yên ku xebatên çetetîyê berfireh dikin.
* Karkirina li ser asta dewletê ya di çarçoveya herêmî de ji bo zeftkirina berpirsên ku destê wan -bi peyt û delîlan- di çalakîyên bikaranîn an leşkerkirina çeteyan de heye. Paşê, li gor biryarên dadgehên navdewletî yan li gor qanûnên niştimanî yên derbasdar, sizakirina wan berpirsan û destdanîna ser hesabên wan ên bankan.

## Rêxistinên Civakî Sûrîyayî ya Sivîl

* Yekkirina xebatên navendên mafnasîyê û rêxistinên ku binpêkirinên mafên mirovan li Sûrîyayê bi belge dikin ji bo kolîna li hebûna komên çeteyan û kompanîyên ewlekarî û yên leşkerî yên ku çeteyan li ser asta niştimanî bi çek dikin û bi kar tînin. Her wiha parastina delîlên madî û dîmen û wêneyên ku berpirsên van karan eşkere dikin.
* Cîbicîkirina sazgêrîyên dadmendîya veguhêzer, wekî dadmendîyeke dermanker a komî ya damezrîner, di dosyaya çeteyan û çekdarên biyanî de; wekî sazgêrîya qerebûkirina ziyanan ên ku hemahengîya civakî dadimezrînin, vegerandina hevsengîyê, peydakirina hestên komî yên dadmendîyê û jinûvedanîna bawerîya qurbanîyan bi dewletê. Hin gavên pêkanîna van xalên borî: Dermankirina kesên ku ji zindankirin, windakirin û îşkencekirinê rizgar bûne, danîna bernameyên destekdan û saxlemkirina derûnî û danîna sindoqeke fînansekirina cebarkirina ziyanan û -bêyî cudakarî- qerebûkirina hemû qurbanîyên binpêkirinan û malbatên wan.
* Ji bilî hesabgirtina ji tawankaran, bernameyên dadmendîya veguhêzer qerebûkirinên ji ber binpêkirinên mafên mirovan ên ku di encama leşkerkirina çeteyan de pêk hatine, li xwe bigirin. Her wiha qerebûkirin û pêkanînên parastina civakî ya ku gerek e her desthilatdarîyek bo malbatên bêsermiyan dabîn bike, neyên tevlihevkirin. Wekî din, parastina mafên ziyandîtîyan û mafên merivên wan ên serîdana li dadgerîyê û daxwazkirina qerebûkirinê eger paşê şêweyên din ên ziyanên derûnî û gewdeyî çêbibin.
* Karkirina ji bo belavkirin û rûniştandina nirxên pirrengî, azadî, wekhevî û nasnameya niştimanî ya yekbûyî di çarçoveya projeyeke niştimanî de ya di ser çand, nasname û siyasetên nesereke re; ji bo têkoşîna li dij projeyên herêmî û hewlên afirandin an vejîyandina nasnameyên nesereke yên li dij nasnameya niştimanî ya Sûrîyayî.

* Têgihandina konsepta taybetkirina berpirsyarîya kesê tawankar û xwedûrkirina ji gotara giştîkirinê û tawanbarîyên sîxurîyê û her tiştê ku ziyanê digihîne xwegirêdana bi welêt re. Her wiha teqezkirina konsepta din a dibêje ku Sûrîya dewleta welatîyên azad û yeksan e û cihê peyvên mîna zorîne û kêmîneyên li ser esasê dînî, tîreyî û mezhebî lê nîne. Sûrîya ew dewlet e ya ku mafên komî yên hemû pêkhateyan, di çarçoveya nasnameyeke niştimanî ya gelemper de, diparêze.

# Zêdetir bixwîn







